# HELEBÇE

SEYDAYÊ KELEŞ

DÎWANA 6

* Helebçe
* Diwana Helbestan 6
* Nivîskar: Seydayê Keleş
* Derhênana hunerî: Mesûd Xelef
* Berg: Rênas Hesen
* Çapxane: HAWAR-DUHOK
* Tîraj: 750
* Jimara sipardinê: 1244

**Ji Weşanên Êkîtiya Nivîserên Kurd - Duhok**

107

**www.duhokwriters.net**

# HELEBÇE

DÎWANA 6

SEYDAYÊ KELEŞ

**BERHEMÊN MINÎ ÇAP KIRÎ**

| | |
|---|---|
| 1- Em û dijmin | Sala 1986 |
| 2- Rêka gel | Sala 1981 |
| 3- Dedê millet | Sala 1993 |
| 4- Ronahî | Sala 2005 |
| 5- Gotinên bav û kalan | Sala- 2006 |
| 6- Xebat | Sala- 2006 |
| 7- elîfba kurmancî | 2006 |

**Û yên ne çap kirî**

8- Berbang
9- Baxistan
10- Bîranîn û jiyana min

**TÊBÊNIYEK**
Vê dîwanê dikim diyarî ji bo hemî keç û xortên Kurdan yên ku bixwazin xwe hînî zar û zimanê Kurdî bikin.

**S.Keleş**

## PÊŞ GOTIN

Di baweriya min de dema ku meriv Kurd be divabe meriv ji Kurdîtiya xwe re bi xebite. Çiku Kurd li her derê dibin ji destê xelkê dinê tengasiyan dibînin û mafê wan wenda ye û ji heq û hiqûqên xwe dûrin û bazadan ji wan jî tê xwestin û ji heqê wan tê xwarin û têne talan kirin jî û bi serde jî tên lêdan û tênperçiqandin û xan û manên wan jî tên sotin û ji bê çarî jî, ji ber ziluma neyarên xwe jî, ji welatê xwe derdikevin û diçine welatê xelkê koçber dibin û li ber der û dîwarên xelkê şerpeze û perîşan dibin û stiwên xwe li ber wan xwar dikin û li cem wan bê rûmet dibin û bi rebenî jî qîma xwe tînin û di qedînin.

Ji ber vê yekê ez dibêjim gereke çi Kurdek li cîhanê hebî diva be ku ji Kurdyetiyê re bixebite çi jin û mêr û bi şev û bi roj ne sekine li gorî.

Ku karibe û bi şêweyekî rast û durist û bi zane bûn û eqla ne bê tevlî hev kirin û ji ra û ramanên tevger û rêxistinên xwe jî der nekevin Çi ku milletên bindest tê kevivn şaşiyan û tevlî hev bikin wê liser wan gelekî rû nê çi ku neyarên wan ji wan xurt tirin wê gunehkiriyê tevdî têxe situwên wan çi ku li wan û mehnakê ne da ku barê wan giran bikin û wan bi êşînin ku biser xwe neyên û nikaribin doza tiştekî li wan bikin û bi taybetî milletê Kurd ku gelek caran ev hati ye serê me û dijminên milletê kurd pirin çiku xeyratên me ne di destên me de ne ji ber vê yekê gelê Kurd belengaz û perîşane dost û

hevalên me tune ne û kesek destên me nagirî û alîme nakin û li mejî na nerin ji lewra ez dibêjim Kurdekî tenê jî ne xebat kerbî çêna be Ew Kurdê ku ne xebite û belengaz be di be ku têkeve dest dijmin wê bi dijmin re bi xebite ewê bîtir kareibe me biêşîne.
Çi ku ew bîtir movika zeîf di mede nas dikî û bi zar û zimanê me zanî û bêtir di karî xwe ji me veşêrî û derbên xerab limexîne û wê dijmin kirêk mezin bidêyê
Ezê ji were nemûneyekê bêjim da ku hûn li ser bi sekinin Wek taha mihyedîn remedan cîgirê Seddam bû û li tenişta Seddam rû dinişt û Kurdan di kujin û bisaxî wan dixin bin axê û Kurd bû gelekên di jî wek wî hebûn ku ji dijmin bêtir Kurd têşandin û ji dijmin dijmintir bûn û bi Seddam Husên re çekên kîmyayî û tev kujî biser gund û bajarên Kurdan de dirijandin, ma Kurdayetiya bi vî rengî ji çi re ye û bi kêrî çi tê ji xeynî xerabiyê pêve nakin û hinek ji me Kurdan jî bi dizî hevalê dijmina ne û bi wan re dixebitin û ji her kesî bêtir jî xwe didin xuyakirin ku bikêrî Kurdayetiyê jî tên û kesekî di ser xwe re jî nabînin û pir ji vî rengî hene û dikevin nav Rêxistin û tevgera Kurdî jî dixebitin û hevalê dijmina ne jî û kirê girtî ne.

Lê di baweriya min de ku rêxistin û tevgera me nêzîkî hev bibin û hewl bidin xwe berû yekîtiyê de herin û hevkariyek bi rast û ruhnî bi hev re çêkin wê karibin rê li ber van kesên xerab bigrin û bendik û pêwendên neyaran jî ji situwên xwe jî sist bikin.
Lê divabe em tev li hev vegerin û Sedemên jihevketinê hew di bîra xwe de bînin û benik û girêbendên davik û xefikan vekin û bi sêngek fireh hevdû hembêz bikin û kul û derdên xwe bi rast û ruhnî ji hevre bêjin û dilên xwe bi temamî ji hev re vekin û bi şêweyekî rast û ruhnî bi hev re bi xebitin
Û îroj ji hemî rojan bêtir pêdiviye û ya ku ji mere hatiye û wê gelek tiştê xweştir jî bên gereke em vê derfetê ji destên xwe bernedin û gerke em ji van tiştên nû re amade bin û bi şêweyekî lez û bez û em nakokiyên xwe bihêlin ji demek dinre

**S.Keleş 2005**

## HELEBÇE

Nameya 1
Ji kêr bêjim çilo bêjim
Ji kû bêjim li ser te ey
Helebca jar û birîndar
Li lolanan
Li gastînan li sikakan
Li devê deriyan li hunduran
li ser bênderan li ser riyan

Xelkên Helebçe
Ra ketî ne û bê dengin
Û zarokên bi çûk jî
Di himmbêza dê û
Bavên xwede
Bê dengin û na lebitin
Gelo çi bela wa ne
Û çi hati ye serê wan

Nameya 2
Ev çi deiwe ev çdoze
Û çi ji me di xwazin
Şev û rojan bê rawistan
Bikim hewar û gazî

Tucan ne poşmanim
Çku xwedî mafim
Ez jî wek wannim
Mirovim ne hirç û hovim

Gelo û bo çi gelên cîhanê
Li ser vê yekê bê dengin û
Çi bela wane qey çiku em
Kurdin bê xwedîne

Ne insa nin li vê tofanê
Li vê gosirmetê li îşê
Li vê janê li vê kuştinê
Li vê talanê li vê nemanê

Nameya 3
Hitlerê didiwan hatiye meydan
Didî ser hev xelkên Kurdistan
Ax ax bimrin faşist bimrin xwîn rêj
Gelên Kurd bikin qîrîn û hewar

Li serxelkên Helebce û xorman
Û ser kel û Şahrezûr û tevê Kurdistan
Ku tev bûne miştaxe bi xerdela
Kîmmya î û fosfrê hatine raxistin

Dengên xwe bibin tevên cîhanê
Û hemî welatên xelkê û
Ji her kesî re bê jin û bixwînin
Û di dilînin Kurdistan û gelê
Kurd tê perçiqan din û fetisan

Din bê xwedî û xwedan maye
Ve gelê Kurd wergirti ye reng û
Kirasê Hîroşima û Negezkî
Dîsa ew raman û ew nerîn
Nuh bûye û hati ye cîhanê

Nameya 4
Li Îraqê li Îraqê û Turkiyê
Kurdistan tê sotin ser û bin
Ax ax gelî milletên
Cîhanê hûn li ku mane
Dengê we nayê çima hûn

Dengê xwe hilnadin û nabê jin
Û destên xwe hildin û bêjin
Li ber xwîn rêjan bisekinin û
Bibêjin bes bes ta kengî hûnê

Bi sekinin û rawistin ji ser
Pişta gelan peyabin
Va li Kurdistanê kêr gihye hestî
Û zingr giha meji em tev tên kuştin
Ejî û tujî ter û hişk tev tên sotin
Mala her kesî xera dibe wêran dibe
Xêra van welatan beyhûde û boş û
Belaş diçe dijmin tiştekî ji xelkê
Welêt re na hêlin û ew tenê dixun
Ax ax bimrî peymana dijî insana

Nameya 5
Xerab xwe didin ser hev û
Her kesî têşînin werin bi nêrin
Li Kurdistanê guh bidêrin
Çi bû ye û çi dibe û giaye ku

Li herder laş bûne kelek
Bi koman genî bûne û nepixîne
Bihezaran ji bîna xerdelê
Hatine raxistin li çarçrî

Û meydanên Helebça jar û bê çar

Cendem bûne wek kelek mîna
Gindoran libr dîwaran û li sikakan
Serû qûnî hevin xwîn ji wan
Di meşe û rêz dibe û serû jêr dibe
Û dibe gol û kesk dengê xwe
    Nake û na bêje ka gurûpên
    Kamisimanî Ax Ax ka gurûpên
    Insanî û dewlî
    Ka partiyên edealata cîhanê
    Ka partiyên xaç û Heyva sor

Nameya 6
Ka koma miletan li ku maye
Û ka kê dengê xwe kir û got
Kê pol firandin û dil li xwe sot
Kê destê xwe hilda û hejand û got

Em xeydîne li ser xelkên
Helebçe û Kurd û Kurdistanê
Ezê çibêjim heval û hogiran
Ezê çi bêjim gelî xuh û biran

Bimirin destik û dûv û dêlên dijmin
Bimirin hemî kesên xwîn rêj
Bimrin hemî ked xwerên cîhan
Bimrin hemî xefik û xayîn

Bimrin dijminên insan û gelan
Bimrin kesên xwîn rêj û gemar
Bimrin dijmnên Kurda û xedar
Ger ku vê nebêjim bê wijdanim

Nameya 7
Bê îmanim ne insanim
Ezê bêjim ne poşmanim
Ne razin gelên Kurd û
Ereb Tirk û Faris
Li ser xelkên Helebçe û Felestînê

Bigrîn û bikin hawar û gazî
Û ji xelkê re bêjin
Em bndest û belengazin
Nahêlin dengê me der kevî

Em tên fetisandin
Di bin darê zulim û zorê de
Bi me ve werin li ser me bigrîn
Em tên perçiqan din û kuştin

Gelo kîxerdel û siyanîdê dîdî wan
Ji bo Kurd û Kurdistan û erebistan
Kê em kirin kul û derdan
Em hiştin perîşan û xizan

Nameya 8
Em na xwazin bimirin em di xwazin bijîn
Gelê Kurd jî wekî hemû gelên
Cîhanê ye xwedî heq û

Mafê wî jî heye
Xwedî welat û kiyane
Bi hezaran keleşên miriyan
Li dora bajarê Helebçe komin
Gelo çilo dan ser hev

Çilo kirin kom çilo veşartin
Xistin goran û gor çilo kolan
Tev bê xwedî û bê xwedan
Xediyên wan ew nedîtin û
Ne gihan ser wan

Gelo kî di xwazî ev bê serê wan
Bi xem û kul tevde razan
Tiştê nemayî hate serê wan
Emê çi bêjin gelî mirovan
Emê li kê bikin hawar û gazî

Nameya 9
Gelo wê kî bi hawara me bê
Gelî miletan miletê cîhan
Gorên fereh û pan dikolan
Û dîsa tê hil ne dihatin

Û têr ne dikir cihên wan
Bi sedan davêtin ser hev
Û hin belbelot dibûn
Û hin di ketin ser hev
Bi xwîn û dev ji hev ma emê
Bikûde bikin rev

Ax ax gelek ji wan nedîtin
Li çol û çiyan bê xwedî diman
Teyr û tilûr kom dibûn û
Di xwarin goştên wan

Bê gur û gorstan diman
Xelkên Helebçe diqeliyan
Û tev heywanên wan û neman
Kanî milletan û xelkên cîhan

Nameya 10
Tevde çûn bê jiyan û hebûn
Ketin bin qadê bin axê
Ev reben û bindest
Ji sedên salan ve nedîtin

Ser xwe bûn û tev de çûn
Top û tangên wan milet tev
Hehrivandin ev gund û bajar
Tev hilweşandin kirin tar û mar
Welat xera bû bidestê neyar.

Reş û hişik dibûn ev dar û buhar
Miçiqîn kehnî ev çem û rûbar
Çiya şewitîn tev bûne tenî
Dixan û doman gihane asman

Kurdên Kurdistan birçî û xizan
Li herder kuştin li her talan
Hemî bindestin mane perîşan
Wê kude herin wê cilo bikin
Ax ax ji me çi divên

Nameya 11
Em divin haştî ji dilê rastî
Na xwazin şer û pevçûn
Di xwazin jiyan û hebûn
Ev çi zilm û zore ev çiye dijûn

Ma kî dixwazî pevketin qerqeşûn
Ey Helebça dilsoz ka ew daxwaz û doz
Ka ew kêf û şahî ka ew cejin û ronahî
Ka ew çax û dem govend û dîlan
Ka bûk û zava ka ew nav têdan

Ka ew deng ka ew fort
Ka ew keç û xort li ku mane
Li dora bajêr çûkek na fire
Kerek na zire kevirek na gindire
Emê çi bêjin em tev de gêjin

Ax ax bimrin zilm û zor
Li jêr û li jor Kurd man
Bê ebor bê hidûd bê sînor
Tu jî bû mêvanê Zêwa hejar
Helebça bê deng û birîndar.

## KURD BELENGAZIN

Ma gunihê kê ye kê ev wisa kir
Gelo dijmin xirakir
Yan me xerakir
Herkes dizanî kê xerdel anî
Seddamê xwin rêj ji bo me anî

Bi leşkerê xwe avête nav me
Ev zarokên hûr hemî bê guneh
Dixwazin Kurd tev bêne kuştin
Naxwazin yek jî bimîne hiştin
Çi ku bi rehmê hiştin dimînî

Ji min bawerkin gelî dostan
Gelî hevalan
Duvê neyara wê bê jêkirin
Ji war namîne
Berê çeka xwe  didin sênga xwe

Bela zanibin dengê me bikin
Têkin guhên xwe têxin serên xwe
Gelê Kurd bi xerdelê
Xelas nade û nayê qedandin
Kurdistan nayê veşartin
Ûwenda nade Kurdistan
Nezine û bi nav û denge

Agirê gelê Kurd nayê vemirandin
Roj bi roj xurt û gurr dibe
Bi sedê salan me xwîn rihandiye
Dar û berên wê bi xwînê hatina avdan

Lat û hîmên wê xwînê reş bûne
Wê çawa bê ji bîr kirin

Em berê tivinga xwe
Ji sênga dijmin na din guhertin
Em Kurdin kurê guhderzin
Kurê şêrgone
Kurê selaheddînê eyûbîne.
Kurê rustemê qellaşin
Baweriya me ji tangû topên
Neyaran xurt tire
Em xwedyê Kurdistanê ne
Gelê me roj bi roj hişyar dibe
Wê bi giraniya xwe bi hise

Û wê zanibe ku gel bi Kurdî
Wê xurt bibin bela dijmin
Zanibin ku çil melyon Kurdên
Mêrxas û gernas hene
Li pişta hevin û hevdû bernadin
Û em heyfa xwe ji gijmin re

Na hêlin û dijmin zora me nabin
Yakîtîya me baweriya me çê dikî
Em dizanin ku emê zora dijminên
Xwe bibin em ji keskî na tirsin
Em îroj xwe di pirin
Em mezin û fireh û xurt dibin
.
Û em destên xwe didin hev
Bi roj bi şev
Bê gomane emê zora
Dijminên xwe bibi

Hêza me nayê şikandin
Emê berû pêşde herin
Zend û bendên me
Nayên tewandin û ne tên çivan din

Û em dirin şer bê tirs û veger
Emm zanin dijmin dijmne
Li her cihû der
Emê dijmin derxin ji roj hilate
Em Kurdin qehremanin.

Bi nav û nîşanin
Welatê Kurda ye
Navê wê Kurdista ne
Dîrok û mîjiwê li ser navê me
Nivîsandi ye
Hemî gle me nas dikin û
Navê me bihîstine û.
Welatê me nas kirine
Dijmin ji tirsa me nikarin razin
Lê ku radizin bitirs radizên
Dengê dimdima lingên me tim
Li ber guhên wa ne

Em Kurdin bi şerefin
Bi wijdanin
Em tucaran na kevin
Ji ber dijmin na revin
Na bezin
Em wek gurê harin

Em bi dijmin karin
Herkes dizanî ku em

Xwedî parin û
Em ne bê xwedîn ne
Xwedî war  û cî ne
Edalet li oişta meyae
Heval û hogirên me pirin
Me soz ji hev siandiye.

Me soza mêrê berê ji hev
Sitandi ye û em na qulipin
Em ne bê kes û kûsin
Em Kurdin bi şeref û namûsin

Herdem em bi gilî û gazin
Emm narazin em mafê
Xwe di xwazin
Em divin azadî û ser xwebûn
Em navin şer û oevçûn

Em di xwazin  hevkarî biratî
Li her derû cî
Bimrin şer û pevçûn
Bimrin dûv û dêl
Bijî ser xwe bûn li her
Li herder ûşûn.

## BO BETROLÊ EM PERÇE BÛNE.

Neywran ji bo neftê welatê me çirandin
Derba xwe li me xistin û Kurd tev tevizandin

Qirdê me xera be û xerabtir jê tunînin
Hinan jî bi dijmin re bi dostî em şikandin

Em Kurdo tu razaye ji xwe tu na be hişyar
Zor dane çia me û findik jî tefandin

Ev ba bi xezeb tê li me em li ber diçin tev
Bes êdî heta kengî bimînin ser çimandin

Cîhan li me tarî bû bicarek bûye şev reş
Djimin bi hiner toz û zeber em fetisandin

Ranazim bi şev û bi roj bi kul u derdim
Ev çewt û kêmasî me li xwe den nixumandin

Ta kengî bitirsin ji neyar her gev û hêr dem
Mizgînê didim we vaye qeyd hate ddiksndin.

Kurdên me çima li hev nayên tevde bicarek
Doza xwe bimêranî bibn ber berizan din

Qeşmer va nema ne bê welat bi al û olin
Tev Kurd va bicarek ji welat hatin deran din

Kurdên me dizanin ku xwedî raman û riknin
Lê çibkin nikarin kelekê bidin diran din

Qirdê me çima wer mirîye bê ser û banin
Mendêlak ji me derna keve nayê weşandin

Em Kurdên me reban tevde hemî birçî û jarin
Nav destê neyar de em hemî tên herivandin

Ey Kurdo ma deng nayê we ka hûn li ku mane
Dersê ji xwe bigrin va hûn tev tên şewitandin

Fermana me rabûye ji bo ax û ava me
Kurdistanê em kuştine dijmin em mirandin .

Deng nayê we hûn tev biguhin ne ker û gêjin
Ev bû duhezar sal xwe li ser we dan meşandin

Nabînin hûn kosovo û hirsikan û bosnan
Dema hûn liser hevbin hûnê bêne himandin

Mala we xerabû ma hûn têrnabin bicarek
Derdê we li min daye ji kokê hûn mirandin

Mêrbin û ne tirsin wê neyar tevde bikin rev
Tirsek tê nema ye vê qeydê bidin şikandin

Ev dema meye ser hildanek ji me tê xwestin
Em pevre nekin xweş zanibin ser tê birandin

Evdem ji mere naçe seaî ger em wihabin
Hûnê li xwe xin hûn zanibin we Kurd şikandin

Ev tişkî hesane dizanim ger hûn bu xwazin
Tiştê jê ditirsim ku ev kar neyê meşandin .

Ev dem ne dema xwe sist bikin kurên qehreman
Rojkê berî rojkê vê perdê bidin çirandin

Derda te li gokê hatiye lêxe bi xurtî
Ne tirs ji keskî bawer bike tê bê himan din .

## BARZANÎ SERÎ RAKÊ

Barzanî serî rake li Kurdên xwe binêre
Ev rengê ku em têdene wer vê bibijêre

Em hev di kujin bend û qayîşan dikişînin
Dijmin dikenin me li hev dikin kêr û penêre

Sebra te çiko tê wer li gorê tu dimîne
Pir mêr bû dizanim çima îroj dibuhêre

Nîşana me navê te ye Kurd bêyî te ne nasin
Şerê xwe bi xwe zanî ku li Kurdistan nexêre

Gazî û hawara me tu ma ye rabe ser xwe
Zanim ku serî rake wê dojmin xwe veşêre

Kurdên me bi carek va li hevdû berizî ne
Em pêk ve ditir sin emê çibkin ji demê re

Navê te li moca me siware şev û rojan
Kurd tev de dibêjin em divê herin şipê re

Em sozê didin te ku tu şahin şahê Kurde
Şev rojê me karê xwe dikir ji vê rojê re

Serdarê me Barzanî ji Barzanê tu rabe
Dor me pir xera be rabe barê xwe bihêre

Ew ba qulipî li ser me tim tozê û gemar bû
Ev bayê ku nû tê keviran li ber bidê re

Va dem ji mere hatiye em têve diçin pêş
Şewq daye stêra me hemî kes lê dinêre

Rê ber bo çîroka me tuye rastî dixwazî
Derba te girane ser li dijmin wê bihêre

Armanc û nîşan me tuye Kurd bi te nasin
Barê me girane pir fireh tê û bigêre

Ev derba ji pola ku te xweş daye rahiştin
Hin çep digerînin û hinek kar dikin jêre

Em xwe bixwe pevdû ketin xwîn tê rijandin
Qîma te çilo tê tu li gorê guh bidêre

Barzanî tu kanî va milet bo te haware
Bênder ya te ye rehêje melhêbê bidêre

Qada me neyar hê tê deye me derdixinder
Em tevde belengazin lê dijmin têde têre

Çûna te ji bo me gelekî derd dane ser hev
Ta îroj bijanin ka gilî bikin ji kêre

Dostên me li cîhan tunin alî me nakin
Zanim ku bela me ev welatê xêr û bêre

Şopa ku te kolaye di latê de bikûrî
Milyûnên ji salan kes nikarî wê veşêre

Navê te li cîhanê belav bûye bicarek
Pesnên te bidin zanim ji wê meidena zêre

Ev reng û ruwên te ku li her malê xuyaye
Her kes ku dibînî dibêjî piling û şêre

Gorî te bibim rabe ji bo mafê me Kurda
Zanim tu ji bo mafê gelê Kurd bervedêre

Dijmin wê ji ber te bi revin tevde bicarek
Navê te li ber dijimin dibî xencer û kêre

Barzanî tu zanî ku neyarê me xedarin
Ta îroj di tirsin û ji navê te xewêre

Tirsa wan ji navê teye dijmin jê dikin rev
Oêka me dema radibî dizanin tu şifêre

Şêr va bûne rivî û ji meydanê dikin rev
Hevalê me bûn rabe li bextên wan binêre

Sunda me bi navê te dimînî ta ku saxim
Pesnê te bidim ta ku kevir bibî penêre

Barazanî mezin ma û li mîjoyê bi denge
Her kes wî dinasî û bi rindî ve dijêre

Mêrxas bû ji dijmin re tu car ser danetanî
Dijmin di şikandin dikirin kom û şikêre

Qamusa me Kurdaye ji Kurdan re nîşane
Remza gelê Kurde li cîhanê û her demê re

Sed rehmet li gora te bibarî melekê Kurd
Navê te bizêr hatiye danîn ji demêre

Mala te xweş avaye ji ber te ser bilindin
Mezgîn me li te vaye Kurdistan ber bixêre

## ŞERÊ ÎRAQ Û ÎRAN

Şer sekinî dijmin çikir
Kê ji Sedam per fêde kir
Li Îraqê çi zêde kir
Kul û keder ji wan re ma

Sed milyar serf kirin neman
Gelê Îraq man perîşan
Wê tev bibin jar û xizan
Çilo bibin para hema

Bi melyonan hatin kuştin
Welat hemî li paş hiştin
Sedamî tev de faşistin
Xêr û xweşî di ku de ma

Xêrên welat tev çûn belaş
Ji dijmin re tev man qeraş
Ji bo miletan bûn qornebaş
Ji wan re qet ruhnî nema

Karê neyaran maye ev
Her şer dikin bi roj û şev
Xwîna me rêtin tevilî hev
Em destên hev nagirin çima

Gelî hevalan meyzekin
Dostan tevan go şer nekin
Heşt sala kuştin bê sekin
Kesek bi dilxweşî nema

Sedamî şer dikir rast û çep
Êrîş di bir tim bi xezeb
Rijand xwîna Kurd û Ereb
Leşkerê Faris jî nema

Sedam li Kurdan şer vekir
Bi xerdelê texsîr nekir
Jehra xedar wî pey de kir
Ruhnî di dil de qet nema

Zêde kir li wî Hitilerî
Biner çikir vî qeşmerî
Vî ehmeqî vî ser serî
Mafê gelan ka li kuma

Tanî bi leşker me îman
Leşker naçî ser me Kurdan
Va derketin tev bê wijdan
Ma kanî wijdan li kuma

Leşker ji jêr anîne jor
Van tang û topan bore bor
Bê wijdanin dil bûne kor
Însan netî ka li kuma

Leşker ji şer vala nebû
Şerê nû peyde bû
Tirsa min pir ji vê hebû
Şer dirêj kir va wek xwema

Me pir di xwest bi sekinin
Dora me tev de dijminin
Yê tên kuştin Kurdên minin
Gundek li Kurdistan nema

Sedam divê çiyan bigre
Kurdistanê tevdî vegre
Kurdên Kurdistanê bimre
Kes deng nakî bo me çima

Şer sekinî bo Kurd çi hat
Xerdel ji mere ma xelat
Mirin serapêl bo me hat
Kesek li Kurdistan nema

Bi Enfalan em ne hiştin
Bi şewatê em birştin
Kurdistanek vala hiştin
Leşker li şûna wan dima

## ZULMA NEYAR

Ji ber zulma van dijminan
Kurd derketin çol û çiyan
Ta sed hezar bûn kuştiyan
Şevroj dixun kul û keder

Sînor li wan asê dibûn
Hawêr şer û zilm û dijûn
Hatin serê wan qerqeşûn
Rojê dixwarin sed keser

Li ser sînor bûn kom û lek
Zarok û pîrek yên gelek
Hatin serê wan sed felek
Bo wan kesî neda xeber

Li ser riyan kom û kerî
Zarokan dê winda kirî
Tevde dikin qîr û girî
Dijmin digo Kurdo de her

Kes mev nayê hewar eman
Kurd der ketin çol û çiyan
Anîne wan çekên giran
Sotin hemî can û ceger

Ji nêza şitêna te mirin
Ji dijminan hew bah werin
Bi qîr û girî li hev digrîn
Ji hev tev mane bê xeber

Bajar û gumd wêran dibûn
Ji ber şewatê tevde çûn
Rêçik hemî tevde bûne xûn
Bi tangî top tev ha te ser

Hewar kirin xelkên cîhan
Kurdek nema li Kurdistan
Nav û nîşan têde neman
Her kes bihîste ev xeber

Dijmin li Kurd bûn wek guran
Tev der xisitn ji hun  duran
Laş kom kirin mîna giran
Li ku hiştin can û ceger

Li ser riyan tev kirine kom
Kuştin li ser wan kirne dom
Êdî ji kê em bikne lom
Kê li Kurdên me kir qeder

Sedamê faşist û xedar
Xwîna gelê me wî vexwar
Emê li kê bikin hawar
Kê li me ra kir ev zeber

Kanî haştî xwazên cîhan
Kanî komara miletan
Ka partiya heqê insan
Şerê neyar tev hate ser

Xelkên Erbîlê û Dihok
Wan rakirin tev de ji kok
Sikak ji xwînê bûn cihok
Heta heta maye keder

Xelkên Zaxo û Mûsilê
Ketin tora zulm û belê
Kengî li wana roj hilê
Taldek nîne xwe bidine ber

Tevdan ji gundan dane rê
Tev reviyan mîna çirê
Ji ber tangan û girarê
Sotin hemî ta her dever

Agir li ser wan rijya
Ne hat serê kes û ciya
Wek çem ji wan xwîn meşiya
Tev şewitîin can û ceger

Rista Sedam tev dijminin
Kurd nehiştin tev kuştinin
Hertişt ji bo xwe hiştinin
Kanî xwedê kanî pêxember

## DIJMINÊN FAŞIST

Dijmin xwîn rên û faşiye
Çadir li ser me daniye
Li Kurdistanê şurtiye
Kurdno rabin dema weye

Qîrîn bidin heta herder
Bo her gelî bidin xeber
Va em dixun kul û keder
Barê giran barê meye

Kurdistan tev vala kirin
Terş û tala tev de birin
Tiştên helî xerab kirin
Kurdo ma ev ne gu neye

Kurdên me tev ser jêkirin
Gunhên gelek bêrê kirin
Herdem li vê rêyê dirin
Ma qey mafê me tuneye

Ka koma mafê miletan
Ka koma efwa dewletan
Faşist bi kêfa xwe diman
Ma qey ev siûda meye

Rabin kombin welatparêz
Dest bidin hevdû bibne rêz
Werin hevdû bikin himbêz
Hevbigirin namûsa weye

Dest bidine hev wekî bira
Herin dijmin li her dera
Berî li we vemrî çira
Dijmin li ser mala weye

Tevde li hevdû vegrin
Li halê hevdû binerin
Ji şaşiyan em vegerin
Nezanî tev para weye

Divê em tev de bibne yek
Hêzan li dijmin bikne lek
Bihevre rast bin em gerek
Xizanî tev para meye

Bibin dostên hemî gelan
Da hûn nemînin perîşan
Em tev bûne jar û xizan
Karê te tev beyhû deye

Divê em qet xwe şaş nekin
Ji yek nijadî bendekin
Eger li dijmin şer nekin
Xerab dibî mala meye

Bi yek çekî tên kuştin
Bi yek destî tên girtinê
Bi yek agîrî tên sotin
Rabin tev dora meye

Dijmin divê me ji rê bibe<br>
Hayê me jê divê hebe<br>
Welat divê sûnda tebe<br>
Ew dijminê mala meye

Neyar neyarê her kesî<br>
Ew nan dihêlin bi tisî<br>
Fêda xwe ew nadin kesî<br>
Ew dijminê min û teye

Kirê darê wan pir hene<br>
Yên wek Sedam tev kolene<br>
Di dersa wan de xwendine<br>
Ew dijminê xwîna meye

Li demûqiratan bi nerin<br>
Bi dû rastiyê de herin<br>
Ji vê armancê ne gerin<br>
Ev raman tev kara weye

Tevde bi hevre sund bixun<br>
Tucar li hevdu hûn nexin<br>
Bi mafê xwe li yek rexin<br>
Ev yêmîşê dara weye

Nebin dêl û dûv terî<br>
Tucar nekin hûn berberî<br>
Bi hev re bin bi raperî<br>
Ava bikin mala xweye

## EY HELEBÇE

Helebça jar Kurd li ser te dikin hawar
Kê hûn kuştin ji ber kê hûn bûn tarmar

Li ser we me hemû zarin kesên dilsoz
Nema zanin emê çibikin j bil hindoz

Divê em Kurd şev û ro zariyan çêkin
Bikin şînê zilf û tembe riyan jêkin

Divê herkes dijî vê zilmê rabin tev
Li Îraqê ji ber segê har nekeve rev

Divê bimrî bi sotin dax divê lê bin
Dijûn û tif li ser hevdû û hey lê bin

Pir xwîn rêje şev û rojan dikî kuştin
Didî ber xwe Kurd û Ereb kes ne hiştin

Wekî Hitiler dikî her dem şev û rojan
Dibî bêjî ku ev insan ev bê wijdan

Ew bê dîne bê îman ne hove çiyan
Gelek hare qe nas nake çiye wijdan

Wekî kabûs li ser gel hatiye danîn
Ji bala wî tucar naçî kuştin û xwîn

Dibe dîn be yan jî har be kurê hovan
Xwîn periste wek qesabê derê govan

Şopa Fir ûn wi girtiye çêkiriye Doj
Nedîn min wek vî xwînrêjî dihat îroj

Xwîna gelê me bê pîvan vî tev rijand
Bi tang û topan wêran kirin û hilweşan

Hûr û merzin tev dane hev ser jê kirin
Pir bi koman birin Xelîc birê kirin

Holako ev tişt ne dikir bîr ne dibir
Xwîn rêj kurê xwîn rêja ye ev dil kevir

Tev reviyan çol û ciyan man perîşan
Bi vê jehra Xerdelê Kurd tev helîyan

Zar û zîçên me yek neman tev de mirin
Kal û pîrên me tevde çûn û hêdirin

Kurd û Ereb tev li wêran dibûn
Welatparêz tev li Îraq ji can di bûn

Heywan û insan li welêt tev de neman
Golên mezin tije kirin ji laşên wan

Tim kuştin û talan û bê şerm û fedî
Hovên çiya wek vîna hê kesî nedî

Dilê min wek dilê diyan di şewite
Jiyan bi vî hovî li me dilewte

Dengê xwe bighînin gelan hemû ciyan
Li Îraqê xwîn meşiya şerê giran

Sedam ji xew zû ra dibe ferman dike
Filan gundî ji Kurdistan talan dike

Divê herkes vî nas bikin ne insa ne
Kerkeda ne bi hinere xwe heywa ne

Ka koma miletan kanî li ku maye
Mafê gelek miletan wan bi derda ye

## KOMA MILETAN

Koma gelan ji bo çi hatiye meydan
Qe nabînî heqê insan li Kurdistan

Binêrin ka li Kurdistan çi çê bûye
Bi Fozforê bi Xerdelê çi pê bûye

Dûman bilind bûye giha ye asmanan
Bûye çîrok li Kurdistan li ser zimanan

Sikak û celde mişt bû ne ji cendekan
Tirk û Îran tijî ji parsekan

Gelên Îraq tevde ji hev bûn şel û şêt
Navê Sedam li Îraqê bûye kirêt

Kes nema karî li welêt rûnê bijî
Kurd û Ereb gem li devin û zik tijî

Hitler li Îraqê vaye bûye serok
Xwîna xortan dimeşînî bûye cihok

Koma gelan gelê Kurdî ji bîr nekin
Guneh karan bidin ber çav texsîr nekin

Ji xelkêre derd û kulan bi rêz bikin
Ji hundur derkevin derve bi hêzbikin

Gunihî vî zalmê mezin bidin nîşan
Bo her kesî fîxan bikin da tev bizan

Hevdû bigirin li hev werin bibin bira
Bişkînin qeydan der kevin ji hun duran

Êrîşî van hovan bikin wan bişkînin
Îraq û Kurdistan ji dest wan derxînin

Heta kengî wê ev hebin dirêj kirin
Barên gelk giran anîn li êş kirin

Herdem dixwazin ku hebin xwînê vexun
Vî welatî tevî divê tenê bi xun

Ji ber vêna êrîşî her kesî dikin
Şev rojê kolanê li rezî dikin

Tiştên ne bûyî ev li îraqê dikin
Gelên Îraq ji ber wan faq faqê dikin

Yên di kujin heqê gulla xwe distînin
Dil û cergên xelkên Îraq pir dêşinin

Li cîhan tev ev reng kuştin kesî nedî
Ji vî karî nema dikin şerm û fedî

Na xwe divê bên kuştinê ev reng celeb
Da xelas bin ji wan gelê kurd û ereb

Seddam ji Hitler pîstire hezar carî
Na şaşe hûn dijî wî bin bi xeddarî

## SEDDAMÊ XWÎN RÊJ

Seddam divê navê Kurd û Kurdistanê
Hilînî me ji xerîta vê cîhanê

Heta sxe ava dikîi vê ramanê
Ew bûue naziyê rastî bi peymanê

Ew nahêlî kesî lid or xwe ne nazîbe
Ne xwîn rêj be ji wana em ne razîbe

Em wek firenko ye li me bûye keleş
Nema ji hev em der dixin trrî û reş

Kude dirin bo me ne hişt ne cih û war
Em di revin şev û rojan li her kenar

Heleca jar car nayê bîr kirin
Welat parêz li zindanan zincîr kirin

Em partiyên insaiyên cîhan tevî
Şerê Seddam divê bibe bi her devî

Em partiyên insaiyên cîhan tevî
Şerê seddam divê bibe bi her devî

Lê sist nebin ta bi kuştin bi xincerê
Jê hilînin heyfa îroj û ya berê
Îraqê pê xistiye
Ne ruh û can li Kurdistan ne hiştiye

Belkî ji gorê ra bûye nûrî seîd
Sddam ji şûn xwe daniye kirye umîd

Ev jî şopa wî qeşmerî yemam dikî
Heroj heroj xelkên îraq îdam dikî

Gel tev li van divê rabin te ku herin
Ev reng teres li îraqê hew vegerin

Ji ber vana koçên revê pir der ketin
Tevde ji nêz û şitêna pevre ketin

Kurdistan tev vala kirin kesek nema
Xwîn û kuştin li van waran tenê diman

Perîşan bûn li îraqê Kurd û Ereb
Li van rastan rezîl dibûn li rast û çep

Birçî û pêxas jî diman li nav seqem
Me çi kiryê ku tê serê me ev sitemm

Cuneh eve çi ku Kurdin bê dewletin
Lewra Kurdên me li herderê bê rûmetin

Ta kengî em Kurd bindesbin li cîhanê
Xelkê em tevde dan kuştin ber nemanê

Biner Kurdno vaye dijmin li me yekin
Şerê xwe bixwe tiyê êdî pevre nelin

Celî Kurdan eve halê bê dewletî
Bê yekîtî bê hev girtin tu kêm ketî

Hevdû bigrin li hev werin tev bibne yek
Hûn wek gelan mezin dibin dibin delek

Herdem li we gazî dikim dikim hawar
Heta kengî li ser webin pîs û gemmar

Werin zora dijmin bibin wan bişkînin
Heyfa bavû Kalên xwe hûn jê hilînin

Dijmin bi şew terlîm dibin bê çek dibin
Ser pêl dibin ser jêr dibin wek seg dibin

Kudno kengî li be rte venin bircû sera
Tu çi bixwazî tê bistînî çek û pera

Zar û ziman li be rte wê şikestî bin
Sênc û çeper li wê veweatî bin

## BERZÊ BERZAN

Bezanî te gelê Kurd hulda ye banî
Riknê me ji kûrve û bi asasî te danî

Her Kurdek divê wêneykî te dyene sêngê
Da tev  zanibin barzaî em da ne xuyanî

Qanûnek wî danî ji mere tevde bi xwînin
Barzanî ji Kurdên mere ev bername danî

Insanî demûqiratî di xwest ku bîne meydan
Şev roj tê diçû kar û xebat wî bo me anî

Em pê ser bilindin ku li roj hilat belav be
Raya gelê Kurde da cîhan tevde bizanî

Rengê te bizêr em dê liher merdanê deynin
Gel tevde divê te nas bikin berz û berani

Ma qey tu nehêjiaye ku em bo te sicûd bin
Bejnê bi tewînin û bi bînin te li banî

Şopa te divê em bidne ser tev de bicarek
Da em pê xelasbin  divê ev bête xuyanî

Ta saxbim pesindarim ji bo ev te  bibme gorî
Serê me  te  Hilda ye û bir ye asîmainî

Gazîkim li Kurdan  tev  herin  goran  bibînin
Axa wan  ramûsin  û li ser ser bibne  banî

Min pir ev di xwesat ku bijiyanî te bibînim
Dîsa ser bilindim ku bi dil min tu dizanî

Ez vaye fedî karim ji pesnên ne li go rte
Lê çibkim zimanê min nikarî te bizanî

Va derfet ji minr hatiye em pê xweş û berzin
Lê zarê mon kurte va pesnên te bêk neanî

Rêberên gelê me te hiştin şêrgel û mêrxas
Va hatine meydan me biwan bawerî anî

Em pir ser bilindin çku wê şopa te digrin
Xweş mêr û egîdin dane ser rêça te danî

Wê bibne serî çar aliyan yek hêz û bendê
Îman bi wan xurte çi u wan fidralî danî

## JI SEYDAYÊ DILOVANRE

Herê seyda ceger xwînê hesarî
Ji mafê me Kurdan kir şiyarî

Eva salek ber çavên me çûye
Te nabî nim ne sibehû êvar

Emê çibkin ji vî bextê reş û kor
Bibî pişk û para me hustu xwarî

Ezê çend gotinan ji bo te bêjim
Ji bo yek saliya te ev diyarî

Li ser te me çiqa bêjin şev û roj
Vî deynê te venadin em tucarî

Hinek pesnên te bê ey dilovan
Hi xêzên te bibaran durr dibarî

Ji millet rt dikir te tim lez û bez
Ji ber dijmin kelemper bû neçarî

Ji îraq û ji sûrî ta siwêdê
Ji bo xwe qet nedî rojek sitarî

Rev û bazdan ku carek çû Îraqê
Gelek caran digirtin bi neyarî

Celî kirbûn ku carek dan siweyda
Li wirjî her xebat û kar û barî

Tevê umrê xwe da  bû ber xetû xêz
Bi van xêzan te millet da şiyarî

Serê Kurdan  bilind kir  ta bi asman
Nayên  dî tin wekî te kes nikarî

Ne bes bo  Kurd û Kurdistan  ceger xwîn
Ji bin  drstan tevan re  bû diyarî

Roja termê te  hat  sûrî yu  seyda
Mêr û jin  tevde der ketin  hewarî

Lehî û pêl ketin millet bi carek
Di gotin qet ne mirye ev hesarî

Mamostayê mezin  giran  buha bû
Wî ronî kir şeva Kurdan ji tarî

Te sistî qet nekir bo gel şev  û roj
Li zindanan di ket bê hiş mirarî

Divê qet kes nebêjî wek te mêrim
Şerê dijmin dikir herdem bi harî

Hemi peyvên wî xencer bûn  li dijmin
Nivîskar tev divê bikin vî karî

Bi wê rêka ceger xwîn em  bikin şer
Ji ser dijmin pera nebin tucarî

Ceger xwîn bû ku tev dane hişyar
Ewî perda li ser me kir zîvarî

Ceger xwîn tov li herder daye çandin
Li wî tovî divê baran bibarî

Liser gora wî deynin kumbeta zêr
Li dor wî xort her şev bikin şiyarî

Tu hêja ye hezar pêean li ber bî
Ne bes hezar bighên hezar hezarî

Ezê bêjim li ser te ta ku saxim
Keleş heqê te nadî te tucarî

Te umrê xwe di ber millet de danî
Hezar rehmet li gora te bibarî

Te ser hilda heta asma nê jorî
Bi te em ser bilindin ey hesarî

Li ser grê ezê hersal herim bêm
Jibîr nakim tucaran bende warî

## ŞERÊ KEVIRAN

Pir dirêj bikin ev şer û pevçûn
Her bajar û gumd xeder û dijûn

Pîroz dikim ez ser hildana wan
Gelek hêja ye ev ramana wan

Pir bi xebitin bo Quds û Colan
Ser hildana wan deng da ye cîhan

Rabin sera ser li jêr û li jor
Li dijmin bibin wek agirê sor

Herin ser xwe bûn bimrin ev dijûn
Gel tev ji bo we dikin qer qeşûn

Yên li we dixin dijminin xedar
Ji ber eana hûn tim bikin hawar

Li welatê xwe divê herin ser
Êrîşkin dijmin bê tirs û veger

Koma milletan wê bikî civîn
Wê biryar bidî ji bo Felestîn

Patakê didim Ramella û Xelîl
Xelkên Felsetîn nema dibin dîl

Şopa gernasan divê bidin ser
Bikin ceng û şer çiye evberger

Rêça Kammdêvid rê çek  xera be
Ji bo Felestîn  tu caran  nabe

Felestîn ji hev dikî sed kerî
Diçîne tovê şer û ber berî

Jin û mêrên xwe daxî nin  meydan
Ramana dijmin  têxin bin lingan

Êrîş dan dijmin kevrû kuçkanî
Bi van kuçên xwe we derb lê anî

Rêbar tev girtin bi pêtên agir
Ber himbêzên wan tijebûn kevir

Azadiya xwe tînin bîra xwe
Dijmin hejandin bi qîr qîra xwe

Mêranî rabûn xwîna xwe danîn
Xwe didan kuştin ji bo Felestîn

## FELESTÎNÎ MÊRIN

Haya cîhanê tev dane ser xwe
Wekî xweşmeran dest dane ber xwe

Dengê xwe birine ta hind û çînê
Gel tev dizanin dirjînin xwînê

Gel tev dibêjin yehûdî şaşin
Bo aleverê gelek ne başin

Armanca wa ye Felestîn bigirin
Nav hedû çeman di xwzin vegrin

Xelkên Felestîn tev didin kuştin
Axa wana tev ji bo xwe hiştin

Li vî welatî dikin xera bî
Ev renge nêrîn di virde nabî

Afarî didim Heyfa û Yafa
Yahûdî xistin nav bend û dava

Berxwedan wan gelek hêjaye
Di vê demê e giranbuha ye

Diçin ser dijmin pir xurt û dijwar
Ji bo mafê xwe tev dikin hawar

Êrîş li dijmin bi germ û xurtî
Bê tirs û bê pirs germî û sertî

Sebra Şatêla herdem dikin şer
Ji dûv neyaran qet nakin veger

Panav tev girtin bi jin û mêran
Xar birin dijmin wan wekî şêran

Bi dengên bilin bi qîr û gazî
Dixwazin bijîn bi serfirazî

Bê razan û xew şevroj kirin yek
Dengên xwe birin ta çerxa elek

Divin bistînin welatê xwe tev
Qadê levakin bibin wekî hev

Xelkên Felestîn pir rijandin xwîn
Zilm û zor dîtin pir kişandin şîn

Zarok tên kuştin pîr û kal digirîn
Birîndar di bin pir ji wan tên xwîn

Tarewar dibin tim ji ber neyar
Girî û gazin halan û hawar

Xelkên Tûl kerim rabûn ber xwedan
Destên hev girtin bi sûnd û peyman

Hevdû şidandin tev bûn yek perçe
Wekî xweşmêran dijmin dan ber xwe

Ser hildan wan hiner dan zanîn
Gavek pir mezin avêtin bixwîn

Guhê min li ser heycana wan
Pir kêfxweş dibim têvedana wan

Qêrîna Xezê perê roj ava
Bo wan dişîinim sedê silava

Çi ku êşa wan e jî pê tê şim
Berxwedana wan ezê pêrebim

Em û hûn gerek destan bidin hev
Bikar û xebat bi roj û bi sev

Dostayê bidin gelê pir mezin
Ber bi wan de gerek em bi bezin

Bi dostaya wan em nabin poşman
Ku bi wan re bin na bin perîşan

Em jî bi wan rwe emê herin peş
Emê bişkînin her leşker û gêj

Zora me nabin faşist û neyar
Ji mafê xwe em tucar nayên xwar.

## JI BO FELESTÎN

Bînin bîra xwe ew cenga Hetîn
Ji wan me sitand xaka Felestîn

Iro jî emin ew gernas û şêr
Emê herin jor  danekevin jêr

Bi ramana rast eme herin ser
Bistînin Qudsê neyar derxin der

Emê hilînin zulma yahûdî
Ji reşê em derkevin rûhnî

Wê dora me bê dema em hebin
Em qet naşkin çi dijmin hebin

Xortên Xanyûnis xortên Birzzêt
Ji hev nakevin nabin şel û şêt

Destên hev girtin ji bo serxwebûn
Da ku hilînin  ev zilm û dijûn

Xelkên Felestîn pir xurt û mêrin
Li ber neyaran piling û şêrin

Bi sûnda mezin em jê na gerin
Ji bo mafî xwe emê bimirin

Wê dirêj bibî şerê me û wan
Emê wan bixin bi sond û peyman

Bibin yek hemî bindestên cîhan
Li şerê dijmin em nabin poşman

Bi zor bi xweşî emê herin ser
Em Kurd Ereb bi şor û xencer

Neyaran derzin ji welatên xwe
Hilînin heyfa bav û kalên xwe

Miletên bindest tev birên hevin
Destan bidn hev tucar nerevin

Ji bîra nekin Quds û Diyarbekir
Bikin doza xwe Bedlîs û Colan

Bo çi her roj em  hevdû nabînin
Derd û kulen xwe pevre na xwînin

Bi yek çekî em  pevre tên kuştin
Bi zilm û zorê me ten biriştin

Li Felestînê li Kurdistanê
Dijmin şer dikî ji bo nemanê

Bi şev û rojan xwînê dimijin
Bi navê navcî me pev di kujin

Li welatên me bûn wek gurê har
Xwîna gelê me wan hemî vexwar

Bi melyonan xort kirin bin erdê
Qîma me û we cima wilo tê

Divê şer bikin li dijmin herdem
Ji wan bistînin tev çiya û çem

Ji war ne hêlin xelîl û Colan
Divê hilinin heyfa xwe ji wan

Azadî divê mafê meye ev
Xebatê bikin bi roj û bi şev

## ÎRAQ Û FELESTÎN

Xelkên Felestîn u ehlê Îraq
Divê bi hev re tev bikin tifaq

Bi şer û pevçûn wê bê serxwebûn
Dijmin heq nadî ku ne rêjî xûn

Aferyê didim xelkên Dêryasîn
Li hember dijmin tim dibin kemîn

Ji ber dijminan tucar narevin
Li ber neyaran tu car nakevin

Çava ramûsim ruhê minin ew
Li enya neyar dikin dax û kew

Bi raperînê dijmin şikandin
Serî li neyar vaye gerandin

Gotin der kevin ji welatê me
Ji wer çênabin deşt û latên me

Dijmin ji ber wan wê her birein
Neyar ji ber wan wê her bikevin

Bi îmana xwe wê bibin milet
Wê dijmin bikin perçe û qet qet

Bi kevirên xwe herdem şer dikin
Bi xeberên tûj dijmin ker dikin

Welat û milet herdem buha ne
Yekin bi hev re û pevre şane

Hêvî me heye emê bibin yek
Ber bi mêranî emê bibin şek

Emê rojekê ala xwe rakin
Serbest û azad emê pê bakin

Ez pir di xwazim herim Felestîn
Mêvanê wanbim li Quds û Hetîn

Ez wan bibînim her gav û herdem
Da dest bidin hev em rakin sitem

Bibin birên hev Kurd û Ereb tev
Bi hev re rûnin bi roj û bi şev

Ji hev hezbikin bi rast û ruhnî
Welat xweş bikin cinet û şînî

Li pişta hevbin hevdû bernedin
Hev biparêzin li ser hev nedin

Quds û Kurdistan bikin yek welat
Tevdî av bidin bi Dicle û ferat

Em pevre bi xun û pevre bijîn
Bibin yek milet tev hev bikin xwîn

## ŞÎNA BARZANÎ

Yekê Adara heftê û nehanî
Ew roja reş bû û biyanî

Pirzor me dîtin diwê demê de
Ta îroj mane di wê xemê de

Kurdên me tev de bi wî binasin
Rêça wî bigirin em pî xelasin

Naçî ji bîra me ew tucaran
Rêber bû ji bo hemî şiyaran

Zortir menedî ji wê ruwê qet
Ew derdên giran û pirî zehmet

Ew êşa mezin tu kes nebînî
Wî derdî li ser tu kes neşînî

Ew êşa giran ji bo me anî
Her sal vaye em dikin xuyanî

Em wê rojê jibîr naskin tucaran
Em nîşana wî dibin her waran

Em tev ji bo wî va dil birînin
Derdê êşa wî va em dikşînin

Mîjo li Kurdistanê xelatkir
Ta îroj ji bo Kurdan xebatkir

Dilsarî li Kurdên me belav e
Kurd tev ketine nêv bend û deve

Gazî û hawara me tu maye
Navê te ji mer gelek buha ye

Gazî giha ye Erbîla rengî
Lê bûye qîr û dengî

Bext ka tu li kuma wijdan tunîne
Dil tevde bive herdem birîne

Bê torin bi hovîtî neyarin
Nan korin li eslê xwe xedarin

Barzanî tu zanî bar gira ne
Çave me li Mesûde ciwa ne

Ala te ewû daye milên xwe
Nêta te ewî kirye dilê xwe

Mizgîn me li te Mesûd berane
Deng daye dinê bi nav û nîşane

Rêça te bi serbestî didî ser
Navê wî bilind bûye li herder

Wê bîne li Kurdistan bu harek
Wê deynî ji bo me bend û darek

Hersal emê roja te vejînin
Rengê te di bîra xwe de bînin

Xweş kir te jiyana gelê Kurda
Hiner te dida zana û merda

Ka rabin tevên Kurdan bi carek
Tev bo xwe bikin hûn kar û barek

Desten xwe bidin hev û bibînin
Benda xwe bi hev re bisidînin

Barzanî li ser ala xwe deynin
Rengê wî ji mala xwe hil neynin

Şiklê wî li bala xwe bihêlin
Heqê wî li alî xwe nehêlin

Cihê wî li gel Kurdan bilind de
Rengê wî li her bajar û gunde

Guftên wî hemî cewher û lal bûn
Wek zîve sipî zêrên zelal bûn

Barzanî tu ala gelê Kurde
Zana û gelek hêja û mer de

Ser rake ji axa Kurdistanê
Binêre tu şaşî û ziyanê

Kurd tevde li ber hev di kemînin
Em tev de ji ber vê dil birînin

Mesûd û Nêçîr her dû buha ne
Kurd tev de bi wan dil xweş û şane

Hêvî me heye wê Kurd bibin yek
Barê xwe bi mêranî bibin şek

Wê rojê emê ala xwe rakin
Serbestî azadiyê bakin

Hêvîme ez gora te bibînim
Ayetekê bi zarê xwe bixwînim

Rehmet tev li gora te bibarî
Navê te ji mer maye diyarî

## HER XEMGÎNIM

Ez xemgînim bo welatê xwe ax
Na xwazim bimirim ez
Divim felatê hey

Dikim doza dest û latê xwe ax
Ta saxim herdem ez
Divim xebatê hay

Diparêzim vî Feratê xwe ax
Vêrê bernadim ez
Divim talatê hay

Her di xwazim van dazwazê xwe ax
Qet jê na gerim ez
Divim lebatê hay

Ez di xwazim hildim barê xwe ax
Daku derxim jor ez
Divim civatê hay

Ez dixwazim bighim yara xwe ax
Tim bendewarim ez
Divim kelatê hay

Her dixwazim yar û tola xwe ax
Li herder dibêjim ez
Divim qerqatê hay

Ez mirî me li ser boza xwe ax
Herdem dixwazim ez
Divim tebatê hay

Ezê bînim dar çinara xwe ax
Li ber xwe deynim ez
Divim wê katê hay

Zûdistînim wê bindara xwe ax
Li hindur deynim ez
Divim polatê hay

Va dîn bûme ji bo yara xwe ax
Tirsim nemînim ez
Divim heyatê hay

Ez dixwazim têxim koza xwe ax
Belendîra xwe ez
Divim xebatê hay

Mirin îroj navim ji bo xwe ax
Divim her hebim ez
Navim şewatê hay

## WELAT BANG DIKÎ

Welat ban kir dilê min tu çawa ye ey Kurdê min
Li her alî xerakir ne neyaran hindure min

Cihê gola wî ma me ez kurê min tu dibînî
Li ser sîngê dilîzin û di xun tev de berê min

Serî rake binêre ku li herder va dikin cengê
Bi kuştin û bi lêdan û bi sotin her derê min

Bi zarê xwe bi xwîne da tu êrîşke neyaran
Wî derxîne û berdêyê bela nexwî berê min

Qelam bigre bi serbestî li ser mafe xwe bêje
Bi parêze ji dijmin tev teve bask û perê min

Bi talan û bi kuştin tu were her ser neyaran
Dizanim tu berê zanî ev tev girê min

Wî ez kuştim hilandim ez bi zorê ketye ber me
Divê rabe tu lêdî wek te pir ketne serê min

Hemî wek te divê yek bin keç û xortan bidin hev
Herin dijmin bi mêranî wî derxin ji hundurê min

Ji nêv gel te dibînim mêr û şerê ey dilovan
De ka rabe bide pey wî nehêle li ber berê min

Dibînim ez dizanim ku xwedî nev û nîşane
Li meydanê weki mêran tu himber ber berê min

Bi xencer û bi şûr tu bi tang û xweş tivinge
Kesek nîne ji bil te ku bibî xweş rê berê min

Tu zana û tu hozane ji nav Kurdan di zanim
Hêjaye ku tu pêşberî li herder ser werê min

Bi wijdanê mirovanî dikî tu tim xebatê
Dizanim ku tu can û mal tev dixî berê min

Herê seyda bi daxwaza te gel tev de diçî jor
Tu ruhnî bû tu rewşen bû û fenerê min

Bigazî û hawarî tim li dûv mafan sev û roj
Dibînim tu di ber gelde xebatkar şevgerê min

Li herder rûdinî tu tim bi gotin û bi guf te
Ji bo min tu qelawiz bû tu pêwan ber gerê min

Wekî kew tim bi qebqeb û bi şîrşîr û bi gevzek
Berê zanim tu xweş mêre bilind û ser serê min

Ji bil te kes qebûl nakim tu seydayê min û xwe
Divê tu rêberê Kurdbî Keleş ser leşkerê min

## TEV BIBIN XWENDA

Bi şev û bi roj herin dibistan
Li paş nemînin tev bibin xwenda

Divê herin pêş Kurdên jêr û jor
Tevde bi xwînin da nebin wenda

Şev tarî û eş herdem li ser me
Bibin hevalên şiyar û rinda

Tariyek dirêj qe nabe ruhnî
Kurdên belengaz man li nependa

Destên hev bigirin herin bo rewşen
Êrîşkin dijmin vemalin zenda

Partîkê çêkin bi sûnd û peyman
Kurdan bikin yek bajar û gunda

Li pêş xwe deynin yên zana û jîr
Komîtan çêkin ji hinermenda

Ev bû du sed sal em mane bindest
Ji bo xwe vêxin agir û finda

Li Kurdistanê hûn bibin xwedî
Heqê weye va mafê we winda

Werin bi carek destan bidin hev
Bi ramanek rast têkevin benda

Divê herin pês gelê Kurd hemî
Li bajêr û gund tev nebin wenda

Ji bo te divim tu bibe dewlet
Dewletek Kurdî xurt bibî peyda

## ŞÎNA HEVALÊ DAWID

Erê Dawid hevalê rind
Xebat dikir bajar û gund
Li her alî dikir qîrîn
Li ser kudan tu dil kul bû

Bi bîr û bawerî xuet bû
Bi dijminre tu pir sert bû
Gelek jîn û xebat kerbû
Ji bo millet tu zengil  bû

Ziman zarê tev dur bû
Xebata te gelek pir bû
Ji Kurdan re ru baginr bû
Dar û şûr tim li ser mil bû

Ye ban dikir tim birastî
Te partî xweş di parastî
Bi  xortan re xwe diguhastî
Bi dev  jenkê tu bil bil bû

Tu gernas û gelek mêr bû
Li meydanê wekî şêr bû
Bi ser bestî diçû dijmin
Ne tirsok û nejî sil bû

Gelek hozan û hêja bû
Çira ruhnî li gunda bû
Li şora lîka peyda bû
Ji xortan re mîna gul bû

Bi ramanê kûr û dûr bû
Li rast û ruhniyê şûr bû
Hezar rehmet li gora te
Tu zana û bi aqil bû

Gelo ew derb ji kû lêket
Li dil min agirek vê ket
Li ser paetî gelek zor bû
Ruwê dostan teva şillbû

Ewê debê em êşandin
Ewên tu jinav me revandin
Cerg û hinav tev hilandin
Pêtek agir li ser dil bû

Karê neyar tim pîsî ye
Herdem dikî xerabi ye
Xebata wan nezazi ye
Dijmin ji dawid pişt kul bû

Neyar li zanan di gerin
Li nerîna wan di nerin
Bi ajanî tim serin
Baerr dawwid tim li mil bû

Li ser groe gelek hatin
Tev li ser te dil şwatin
Heta saxin te ji bîr nakin
Kelşs li ser te dil kul bû

Herê dawid tu dawid bû
Li nav xortan hud hud bû
Hevalekî pir zana bû
Gelek hêja û aqil bû

Hezar rehmt li gora te
Bibrasî sed hezar qa te
Bi gorî bibin dijmin
Li ser te dil limin hil bû

## TEVGERA RAST

Tevgera rast kirinê hat
Em bi wê pir dil geşin
Li welat wê şîkirin kat
Kurd hemî pê dil xweşin

Sûnd di xun em tev bicarek
Em divê tev bêrebin
Rastiyê şîkir buharek
Pesn û nav tev jêrêbin

Va ye em pê ser bilindin
Kurd bi carek pêre ne
Yên ki bajêr û li gundin
Dengê me tev jêre ne

Ev wealt wê xweş bibî pê
Wek bihişt û şaneşîn
Mal û can tev pê bidî tê
Jêre deynin can û xwîn

Ev welat bo me buha ye
Em bi wêna ser bilind
Bo me Kurdan pir hêja ye
Em li ber wê mûm û find

Barzanî zanim tu şêre
Vaye şêan nas dikî
Bo neyarnan xurtû mêre
Çav li dijmin der dikî

Ev serok zana û jî re
Pir hêja ye bo welat
Pir ji Kurdan hez dikî ew
Jêr dikî kar û xebat

Ey xwedêyo wî bihê le
Li jiyanê herde mê
Bo me Kurdan her bimîne
Nedî me kul û xemê

Her dibînin cejjne bo me
Hêviya Kurdên cîhan
Em ji keskî na kin lome
Çi ku Kurd tev perîşan

Ev riya rast û durste
Gelê Kurd tev bidne ser
Werne her sal xwe bidin ber
Ew ji bo mer pêximber

Bîr bibin vê tê bighîjin
Her di bîra xwe bînin
Nabin poşman em tu carî
Her sal enm ve gerînin

Ev bi destê meve tê ye
Em di karin çibikin
Ev ji bo me zanim çê ye
Dema em kêfê bikin

Ev çi hale tê dijin em
Tev bi carek perçene
Belengazin li hemî der
Em Kurd ne ser bi xwene

Ta bi kengî em bindest bin
Em ji xwer ne kin xebat
Bê dev ûzar û ziman bim
Em bi mînin bê lebat

Bi gelanre bibin dost
Çêtire ne bi wan rebim
Oev giêdin bendû hêzan
Bo dijmin em pev re bin

Kes me nas nakî bi rastî
Em kîne û ji kune
Em Kurdên Kurdistanê ne
Em saxin ne mirine

Em divê destan bidin hev
Ev gelên klurd û Ereb
Em birastî dostê hev bin
Pevre bin herdû celeb

Va keleş her dem dibêjî
Tev gelên vê deverê
Werin destan em bidin hev
Ba ku dijmin bi mirê

## KOMA ÇAR ÇIRA

Hezar nehsed heştê nehan
Bi pazdehê meha şeşan
Komek çêbû çar çiran
Torevanên  Kurdan wrin

Komek cira hûn vê ketim
Ji şev reşê ketin
Ser bibindin bi rûmetin
Şev û rojan bi tev gerin

Ji meydanê hûn hatine der
Bi nîşanê hûn hatne ber
We herivand sênc û çeper
Li xebatê hûn dierin

Hêvîdarim hûm  herne pêş
Barê torê bibne êş
Derman bikin deba dirêş
Li tora xwe baş venerin

Ev kom ji bo gel hati ye
Rewşen li gel hitati ye
Pir paqij û parasti ye
Tore vanin bi hine rin

Gelî tore vanên millet
Rojek ji bo we der diket
Ristan bixwînin xet bi xet
Li toreva nan bi gerin

Ey ristevanên Kurdistan
Binvîsin hûn şev û rojan
Pevre bixue sûndû peyman
Tevde di torêde herin

Bo millet hûn bibin rewşen
Bi torê rebin bi kêf û ken
Bi qetînin bend û kefen
Ji dûv torê vene gerin

Ev kom koma pêlewanan
Ji zana xwende vanan
Pêşde dibin perîşa nan
Ji Kurdan re ew rêberin

Çira û rewşen û bîrin
Hozan û zane jîrin
Baş rêberin deste gîrin
Ji bo milet ew ser werin

Bi vê torê bikin xebat
Di nav gel de bikin lebat
Va ye îroj demma we hat
Li tora xwe hûn ba werin

Li vî karî dest bidne hev
Li nav Kurdan bi roj û şev
Ji ber dijmin qet nekne rev
Vê ketî bin vene mirin li vê şûvê
Baş cot bikin
Li her guhî pot pot bikin
Wê seva reş ser sot bikin
Herdem bi ser hevde herin

Bo vê torê xwe bê şînin
Bi xiyalan xwe pêk bînin
Hûn cewgeran birê jînin
Li tirsokan hûn nenerin

Ji vê torê şermê ne kin
Rewş û nîşanan pêvekin
Torevanên jîn peydekin
Konê tora xwe vegiein

Millet hînî zarî
Şev û roj vî karî bikin
Tucarî ser sarî nekin
Bi terezû lê vegerin

Ger hûn bi xwazin her hebin
Hûnê ji torê vene bin
Divê herdem hûn pêre bin
Torevan tucar na mirin

## HELEBÇA DIL SOZ

(Ey sehîdên Helebce dil li ser we perç perçe
Ketin nav bax û rezên we hov yy hirçe

Gelî şhîdan serên xwe rakin û baş binêrin
Barêz gehên me li karin û kas biwan  nikarin

(Ey şehîdên Helebçe dil li ser perçe perçe
Ketine nav bax û rezên we hov û hirçe

Werin li Erbîlê binêrin  pir bilin de li pesare
Payîtexte pir asêye bilinde nayê xware ah

(Ey şehîdên Helebçe dil li ser we perçe perçe
Ketne nav bax û rezên we hov û hirçe

Yên ku êrîşkin me Kurdan  têne sotin têne kuştin
Li jiyanê qet namînin tênan û biriştin ah

(Ey şehîdên Helebçe  dil li ser we perçe perçe
Ketin nav bax û rezên we hov û hirçe

Perlemana Kurdistanê we li dare pyae dare
Yev wezîr û mîr gernasin jîrin  şeh siwarin

(Ey şehîdên Helebçe  dil li ser we perçe perçe
Ketin nav bax û rezên we hov û hirçe

Va ye Kurdistan ev deşt  û zozan der xistin
Dema  me hat bin destan de nehiştin  biser xistin

(Ey şehîdên helebçe  dil li ser we perçe perçe
Ketin nav bax û rezên we hov û hirçe

Li Kurdistanê neman perîşan û bindest û reben
Qetandin kos tekû zincîe û pêwend û ben ah

(Ey şehîdên Helebçe  dil li ser we perçe perçe
Ketin nav bax û rezên we hov û hirçe

Em hew dibî nin rev û bazdan û kuştin
Kurdistan tev dt li ser navê xwe hiştin ah

(Ey şehîdên Helebçe  dil li ser we perçe perçe
Ketin nav bax û rezên we hov û hirçe

Dawet û şahiye govende li her der danîne
Navê dewleta fidrlaî hatiye danîn û neimete

(Ey şehîdên Helebçe  dil li ser we perçe perçe
Ketin nav bax û rezên we hov û hirçe

Dîsa me gavên xwe avêtin da em bibne dewlet
Me nîşan û armanc girtine û çira me vêketiye

(Ey şehîdên Helebçe  dil li ser we perçe perçe
Ketin nav bax û rezên we hov û hirçe

Em nema bere paş ve di gerin û emê herin pêş
Nema em dibînin sergêjî û jan û êş ah

(Ey şehîdên Helebçe  dil li ser we perçe perçe
Ketin nav bax û rezên we hov û hirçe

Doza me ketiye nav dewletan û em bûne milet
Mizgîna min li we gelî şehîdan Helebçe derket ah

(Ey şehîdên Helebçe dil li ser we perçe perçe
Ketin nav bax û rezên we hov û hirçe

Hilma xwe berdin asîmanan û devê xwe têxin
Behran û destên xwe vegirin li ber xwedan ah

(Ey şehîdên Helebçe dil li ser we perçe perçe
Ketin nav bax û rezên we hov û hirçe

Şehîdên Kurdistan yên Helebçe dîsa serên xwe
Rakin hûn kum û kolosên xwe bidin serên xwe

(Ey şehîdên Helebçe dil li ser we perçe perçe
Ketin nav bax û rezên we hov û hirçe

Xan û ramanên we ava bûn û bû ne eywan û sera
Li Kurdistanê bi gerin û herin hemû şax û devera

(Ey şehîdên Helebçe dil li ser we perçe perçe
Ketin nav bax û rezên we hov û hirçe

Kes îşê xwe ji we nayî ne û herin bibin serbest
Dijminê we pîs û rezîl bû ye û ji ser we şikest

(Ey şehîdên Helebçe dil li ser we perçe perçe
Ketin nav bax û rezên we hov û hirçe

Îroj xelk li we di gerin û li we pir bawerin
Dijminên we mecbûr dibin û li we dinerin ah

(Ey şehîdên Helebçe  dil li ser we perçe perçe
Ketin nav bax û rezên we hov û hirçe.

## ŞÎNA SEYDAYÊ TÎRÊJ

Tu nîşana mebû seyda yê Tîrêj
Tu sitêra mebû tubû gelawêj

Belê seyda te em dane kul û xem
Tu dîwana mebû tubû serecem

Tubû êko te germî pir dida me
Bi me xweşkir te ev kar û keda me

Te barê me giran kir ey hevalo
Te xatir jî ji me ne xwest çima lo

Te em kuştin bi vê derba xedare
Te dil sotin li me hişkir buha re

Tu seydayê me bû rênasê Kurda
Çima îroj te zû destê me berda

Tu hêjabû çima te ber ne bir ser
Alîkarê gelê Kurd bû li her der

Te nivco hişt çima niha te darê
Emê êdî li kê bikin hewarê

Erê seyda ji nav me tu cuda bû
Te benda me şikand û pir xerabû

Tu hevalê Cegerxwîn û Keleş bû
Roja tu çû rojek gelek nexweş bû

Wer em çêkin civat û kom û cerdan
Da ku dijmin bidin mafê me Kurdan

Serî rake were bayê me rabû
Ji êlûlê ve ev çîrok xuya bû

Tu mizginê bide koma şehîdan
Bide Xanî Cegerxwîn û Qedrîcan

Ji wan re bêj Keleş va nane çekir
Ku yezdanê mezin wî bo me çêkir

Dem htiye wê perde ben çirandin
Qeyd û zincîr wê tev bên sikandin

Bê xem razê neyar wê ev nemînin
Milet tev de va li ser wan bikinin

Dema bimirin wê gel tev bêne meydan
Li Kurdistanê na mînin perîşan

Ezê bankim ji Gir kevtar tu rabe
Welat dertê dibin destan de nabe

Were cejna me pîrozke birawo
Gelê Kurdî bûye gian buhs wo

Emê êdî derd û kulan veşêrin
Li ber bayê demê keviran emê bidêrin

Dema me hatiye dive ne razin
Şev û rojan heqê xwe em bixwazin

Milet tevde li bîranînê kome
Li ser şînê dikşîn bi dome

Hezar heyf û mixabin tev dibêjin
Serû jêrin li ser te mest û gêjin

hezar rehmet li gora te bibarî
hezar baqê gulan bo te diyarî

# ŞÎNA SAZBEND MIHMED ŞÊXO

Ezaya we dikim ehlû hevalan
Bavê Felek naçî ji bîr û balan

Ji bîr nakin tu caran te birawo
Li cem Kurdan tu hêja û buhawo

Birayê min kurê Şêxo Mihemed
Li ser te min keder xwarin hezar sed

Dilê min va li ser te maye xemgîn
Bi min dengê te û saza e şêrîn

Ne ez tenha ji milet vê dibêjim
Gel Kurd tev dibêjî lew dibêjim

Hemî karê te pir hêja buha bû
Mimheme Şêxo ji saz benda xuya bû

Hinermend bû bilind bû pir giran bû
Mexabin ku ne pîr bû hê ciwan bû

Umîd xurtbû ku hîn gavan bidî pês
Ne wijdan bû ku lê peyda bibû êş

Gelek mêr bû bi miletre dida soz
Ji bo mafê gelê xwe tim dikir doz

Bi sazê re dema te deng di berda
Te jan dixist dilê jarên me Kurda

Serî rake li ser tirban binêre
Milet çawa li dor te bû ye gêre

Wekî lehiyê li dûv te pel dihatin
Dizanim tev li ser te dil şewatin

Bi qîr û deng û halan û bi dor dor
Girî û şîn û hawêr deng di çûn jor

Bi navê te digotin dil birîndar
Li ser gora te bû fîxan û hawar

Nexweş bû ku te îroj ser dildarî
Bê goman ne tu halê Kurd dizanî

Berê xwe te bi Kurdan re nebir ser
Gelê Kurdî bext xerabe li her der

Çima qirdê me Kurdan vaye kore
Felek herdem li ser me zilm û zore

Te dengê xwe ji bo me hişt bira der
Bi dengê te em dikşînin sed keser

Em guhdarê saza tene şev û roj
Li her kêf û li her şahî û newroz

Te jan dida dilê milet bicaewk
Ji milet re te da milên xwe barek

Te ew barê xwe avêt ser milê me
Dengê saza te xweş kir zengilê me

Dengê saza te hêja û bilinde
Te cih çêkir li her bajar û gunde

Bi wî dengî te êş gihan de dijmin
Lê xatir va te xwest heyf û mixabin

Ji me loman neke heval li gorê
Ji tengasî dikin em bore borê

Tu çûye lê ji mer dengê te maye
Li cem Kurdan tevan giran buhaye

Tu mal nînin li wir dengê te nayê
Li her civak saza te jîn dia yê

Bê kêmayî li herder ser bilind bû
Li nav milet wekî çira û find bû

Çiqas bêjim nikarim heq bidm te
Ji ber te bar giran kiriye li ser me

Ji bîra gel tu naçî qet tu caran
Tu tê berdan li nav û şiyaran

Tu hêja bû ji milet re dilawer
Li jêr û jor li Kurdistan ser ser

Ji milet re divê hebin xebatker
Dengê saza te jî kare li herder

Hezar rehmet li gora te bi barî
Hezar baqê gulan bo te diyarî

Heval mala te ava ye tu ser ser
Ji te sipas dikin em Kurd li herder

Keleş zanî cihê te xweş bihuşte
Emê çêkin ji bo te pir niviş te

## ŞÎNA CEGERÊ REŞO

Ceger te ceger li me kirin pêt
Ev can te li me dikir şel û şêt

Êşa te giran û pir xeda re
Serê me ji ber te xûz û xwar

Ceger te hulek mezin dida me
Êşa te giha her devera me

Ceger te birîn li me kirin kûr
Goman û hesên me te birin dûr

Xwedanê me ev qeder dida me
Kêm nabî tucaran kedera me

Ceger cegera mebû dil û can
Hêvî me hebû biba dilovan

Şêrînbû ji roja xwedê dabû
Bextê wî çima li me xera bû

Ceger te ceger li me kirin sot
Li şûn xwe te hiştin defeter û pot

Te dil û kezeb tev şewitandin
Ev cerg û hinav te tev hilandin

Rabe tu binêr li ser te bû şîn
Dotmam û zerî li ser te digrîn

Girîn dikirin ta deng mirandin
Sînga xe li ser te hdimandin

Kincek û cilên xwe tev qetandin
Rû û qirikên xwe tev çirandin

Goman li te bû tubû keda me
Va te vemirandin find û çira me

Hêvî me li ser te dan girêdan
Lê vaye te em hiştin perişan

Heval bandikin ceger tu kanî
Tu li xwedagehê qet ne xuyanî

Sebra me tu bû tu bû çira me
Herdem tu dibû bend û bera me

Ceger te dil û ceger helandin
Cobar te ji çavên me meşandin

Xwedêyo çima siûd nedayê
Dêka wî tekir vê tayê û ayê

Dêka wî şev û roj vaye digirî
Zîvarî kirin çarik û hilbrî

Raman û hêvî te tev mirandin
Ser dem û felek li me gerandin

Qirdê me çima wiha xera be
Gomana me tev ji hev bela be

Hekîman nedîn ji bo te derman
Ruh û kezeba me wan bi derdan

Çima medî ji bo te çare
Zûbun me çima nekir dubare

Belkî cegerê me ji mere maba
Kêfxweş wê biban Reşad û Selama

Seydayê Keleş va dilbirî ne
Rista xwe li ser te va dixwîne

Em qet vê ji bîr nakin tucarî
Zanib ku ji bîra me tu narî

Dil û kezebên me ev te sotin
Kêmasî çibûn me tevde gotin

Xwedêyo çima te li m wakir
Bextê xwe li me te zû xera kir

Bextê me reşe qirdê me kore
Her sal ji mere belak li dore

Ev derba xedar bo çi te leda
Cezaye vê derbê kê û kê da

Kelkê te Keleş li ser te digirî
Haya wî nebû wiha tê bimirî

Gunhê me çibû em qet nizanim
Carê ji mer bêj da em bizanin

Resadê reben dil ma birîndar
Destê wî li karê wî dima sar

Hêvî me xwedê sebrê bidî wan
Da bes bikêşin van kul û derdan

Dêka wî ji cem we bike razî
Şûna wî dagrî wek dixwazî

**30-5-2001**

## GOTIN Û ŞÎRET

Bela hezkirin doz û daxwazên we bin
Bela hezkirin dan û sitandinên we bin
Bela hezkirin çav û nav û gavên we bin
Bela hezkirin nerîn ûzanên we bin
Bela hezkirin nan û av û yemekên we bin
Ax ax ezê çibêjim
Û çi ne bêjim

Divê hezkirin armanc û nîşanên webin
Divê hezkirin raman û pêzanînên webin
Divê hezkirin şewr û mehrecanên webin
Divê hezkirin ruh û hil mij û jiyanên webin
Divê hezkirin rabûn û rûniştinên webin
Ax ax ezê çibêjim
Û çi ne bêjim

Li bîra xwe bînin cih û warên xwe
Li bîra xwe bînin kes û karên xwe
Li bîra xwe bînin gund û bajêrên xwe
Li bîra xwe bînin roj û meh û salên xwe
Li bîra xwe bînin rez û milk û malên xwe
Ax axa ezê çi bêjim
Û çi nebêjim

Nayên bîra te civat û govend û dîlanên te
Nayên bîra te keç û xort zerî û cihêlên te
Nayên bîra te mij û moran û hevalên te
Nayên bîra te qews û kevan û kakilên te
Nayên bîra te gazî û nalîn û hewarên te
Ax ax ezê çi bêjim
Û çi nebêjim

Ka em bo çi mane tev derd û keder û kulin
Ka em bo çi mane em tevde bê pişt û milin
Ka em bo çi mane em bihêstir û çavên şilin
Ka em bo çi mane em her yek bi xwe dibilin
Ka em bo çi mane em tev bi xwe re du dilin
Ax ax ezê çi bêjim
Û çi nebêjim

Ka em liku mane destên xwe bidin serên xwe
Ka em liku mane û bibin dawî ser û berên xwe
Ka em liku mane vekin senc û ber çeperên xwe
Ka em liku mane rahêjin nihît û hem kivirên xwe
Ka em liku mane çêkin zêr zeber û perên xwe
Ax ax ezê çi bêjim
Û çi nebêjim

## RAMANEK NUH

Gelî Kurdan bi ramana nû hûn bakin
Li hev rûnin zû dermanê xwe peydakin

Ne va ye Kurd hemî jar û belengazin
Werin rêka tenê bigirin û pê bakin

Tevê Kurdan li herder va belav bûne
Ji birçîna bi qîrîn û bi lak lakin

Li hawêr xwe binêr va gel li hev hatin
Çima em Kurd tenê mane li hev nakin

Dijûn û şer û pevçûn tev xera bû ne
Werin em Kurd ji nav xwe van tevan rakin

Riyek rast û durist bo me çi derma ne
Divê em Kurd li hevdûbin bo hev bakin

Ji bo na kes ne bêjî Kurd bikêr nayên
Divê Kurdên cîhan tev perça kin

Bela her kes bibêjî Kurd pir zana ne
Zilm û zorê liser xwe em qebûl nkin

Ji bo derdê dilên xwe em divê yek bin
Li rojhilata Ewropa em meyza kin

Va almanan dîwarê xwe hilweşan din
Çima em jî dîwarê xwe rana kin

Bese Kurdno heta kengî emê wabin
Ta me qet bin ne em rindin ne em pakin

Divê rêkek rast û durustî em bigrin
Ji bo mafê gelên xwe em qe eng nakin

Li Ewropa binêr da ketine meydanê
Gelî Kurdan werin çavan ji xew rakin

Va Ewropa hemî xwe didin ser hev
Li jêr û jor ji bo mafê xwe yek xakin

Çima em Kurd yek nijadin ji yek xakin
Nikarin em bi hevdûre bin ne em cakin

Were em tev bi hevdû re bibin yek hêz
Gerek em tev yek kongira xwe avakin

Siyasîbin ji bo xwe em divê xurt bin
Yek nerînê bi hev re bin hev dû rakin

Dijî hevdû ne bin herdem bi hevrebin
Li yek sopê yek perçebin pevre bakin

## KOVARA GULÎSTAN

Vê ristê ez bi kar tînim
Guman ji bo çara we ye
Vê kovarê xweş di xwînim
Cihê pesin dara we ye

Têde şiyarî dibî nim
Nîşan û rû bara we ye
Gul çîçekan lê di çînim
Cohê xweş ew wara we ye

Kêmasiyê le nabînim
Paqij û dî dara we ye
Ava gulan lê direşînim
Bi nefşû ser dara we ye

Bi kûrî lê di kolînim
Cihê nivîsara we ye
Sêv û hinaran datînim
Mey xweşa mişara we ye

Tirhû gulan jê dertînim
Bejin dar çinara we ye
Li her gundî di gerînim
Xebat û ser kara we ye

Pirsen pir xweş lê datînim
Dibî ber pirs yara we ye
Pele gulan di weşînim
Li gastîn û tara we ye

Awir li yarê dikşînim
Naz û gulî zara we ye
Bîna miskê difûrînim
Yarê bende wara we ye

Di vie de bo we dertînim
Sundim bo sitara we ye
Durr û cewheran dirjînim
Qezence û kara we ye

Reşî ji nav we dertînim
Sipî wek hizara we ye
Derd û kulan di revînim
Nû jend û kevnara we ye

Li her baxî ez di çînim
Zanim ku ew yara we ye
Di ber xwede xwe têşînim
Derdim ji bo para we ye

Armanc li ber we datînim
Ev yêmîşê dara we ye
Her dem di xew de dibînim
Beroj û zinara we ye

Perdê ji ser ez hiltînim
Meydan li ber xara weye
Can bo welat ez datînim
Perweya dîgara we ye

## LALO HEVALO

Ez yek dibêjim kes nedî
Ji bextê xwe reştir min nedî
Lalo bira wer lê binêr
Da anbin tev de gidî

Çil sale min qîr û hewar
Armanc û nîşanek didî
Her lê di kolim şev û roj
Xwe lê didim sed ji sedî

Hêvî û daxwaza mine
Rizgar bikim vî beledî
Dema şiyar bin Kurd hemî
Li Kurdistan dibin xwedî

Bextê me bê ol û kirêt
Herkes va me wirde didî
Kesnabî seyda ev li min
Hertişt xuyaye va wedî

Pir sal û dem beyhude çûn
Destek ji bo xwe me nedî
Destê me vala ye ji lew
Ger ne weba min rê didî

Ez çibikim destê min kine
Naghîje ber devê xwedî
Destê şikestî bin kevir
Janê ji nava dil dîdî

Jana min û gel tev yeke
Rojek me xwe dil xweş nedî
Ez ban dikim mêr û jinan
Can û ceger tev tê didi

Meydan li ber mêran giran
Dem va ye bo te rê didî
Hespê sipî bende weye
Hey hey bi zengo lê bidî

Mêrxas û yên pir jîr divên
Bi tirs û bê şerm û fedî
Ger em nekin wê kî bikî
Di ber tede wê kî bidî

## JI GUND BIÇIN ŞARISTAN

Ji gund diçim şaristan
Ji bo bibim xwende van
Paşketin bixwînim
Da ez nebim perîşan

Nexweşiyê hilî nim
Da ku wê bi hilînim
Tovê xwe lê biçînim
Li bajar û li  gundan

Bibim hozan û rê ber
Ramana xwe bibim ser
Şev û roj lê bigerim
Welat vegrim sera aer

Bi edatetê bankim
Millet ji xew şiyarkim
Ta biçûkan bi kar kim
Dema weye tê herin

Rabin herin ser çiyan
Vegrin xax mîdiyan
Li cîjanê degn bidin
Nebin wekî sêwiyan

Destên xwe tev bidin hev
Pevre rûnin roj û şev
Dema ji hev hez bikin
Dijmin wê tev bikin rev

Qadê ji wer bihê lin
Wana tevan bi şêlin
Tevde hûn kêf xweş dibin
Ne xweşiyê nehêlin

Barê we sivik di be
Derdê we hindik dibe
Dema ku hûn herin pêş
Ruhnî û findik dibe

Ser xwe bûnê bistînin
Dil xweşiyê bibînin
Êrîşî dijmin bikin
Heyfa xwe jê hilînin

Nema derdan bikşînin
Qeydan ji nig bişkînin
Dijmin divê der kevin
Xwîna xwe lê birjînin

Azadî gelkî xweşe
Herdem me dil pê geşe
Bi zarê xwe bi xwînin
Bi kokê re bi meşe

Hûn hilgirin vî barî
Dijmin bi me nikarî
Kurd hin xurttir dibin
Şax bidin her kenarî

Divê em dest hilînin
Xwe ji bin destan derînin
Welat bikin wek cinnet
Dijmin ji ser hilînin

## ŞÎNA ISMETÊ SEYDA

Hevalê Ismet gel li ber te ket
Hêja û rind bû tu pir delal bû

Hevalê heval bruh û can û mal
Ji nav hevalan tu şîr helal bû

Ji nav me tu çû çûna te zûbû
Mizgî nek ne xweş ev nae tufal bû

Destê me çima niha te berda
Lez û beza te bo çi betal bû

Te xatirna xwest te çû dûrî dest
Şeva ku te çû me ne tuhal bû

Tu bêyî me çû tu nestêle bû
Ma bext wisa ye ev çi xiyal bû

Nebaşên Kurdan tev bibin qurban
Mêr û genas bû rustemê zal bû

Xebat te dikir roj biroj pir tir
Jana gelê Kurd herdem li bal bû

Li bajar û gund tu wek mûm û find
Ji kul û derdan herdem bê hal bû

Derdên te kûrbûn nerîn jî dûr bûn
Bi kar û xebat gelek şepal bû

Bê seknû tebat yim kar û xebat
Bo derdê millet tim ne li mal bû

Şopa ku digirt rastû durst bû
Gotinên wî tev cewher ên lal bû

Bo çi tu zû çû dil tijî kul bû
Bi şirû ristan dil nalanal bû

Heyf û mexabin zana û jîrek
Ismetê seyda zêrkî zelal bû

Roja ku tu çû rojek ne xweş bû
Şevek pir ne xweş bê teim û tal bû

Li ser te herdem kulan dikşînim
Tu dil paqij bû tu xweş heval  bû

Hevalrr delal gel li te helel
Bi dîtina min tu pir zelal bû

Rehmet li gora te pir bibarî
Çiku hêja bû rengê şepal bû

## BIGRIN QELEM Û DEFTER

Begrin qelem û def ter
Da ku hûn bibin rê ber
Bi raman û pêş verû
Da ku hûn tev leşker û gêş

Herin herin herin pêş
Da nemînin derd û êş
Kurdên jêrî û jorî
Bibin tev leşker û gêş

Bi ramanek nuh bikin
Kurdan ji xew rabikin
Da kes li paş nemînî
Bo welat rizgar bikin

Derdên me pir giranin
Kulên roj û şeva nin
Divê tev bên hilandin
Hûn hogiç û beranin

Kurdên me tev bela bûn
Hemî tevlî gela bûn
Ev welat vala hiştin
Kurd li welêt nemabûn

Hewar hewar dikim ez
Tev hiliyan cerg û bez
Li şûn waran bimînin
Bikin doza xwe bilez

Kurdên me tev birçî ne
Tev pê xwas û tazî ne
Belengazin şev û roj
Dil û ceger mirî ne

Nikam li ser vê razim
Şev roj ez dê bixwazim
Li ser vêrê bimînim
Bi dûv de her bi bazim

Biçim bajar û gunda
Meh bi meh bibim wenda
Divê millet şiyar kim
Vêxînim mûm û finda

Divê welat bistînim
Ji dest dijmin derxînim
Tim diserê min deye
Şev û roj vê dixwînim

Divê herim ser çiya
Vegrim axa mîdîta
Kul û derdan derman kim
Bibim xwedyê van ciya

## ÊRÎŞA KUWÊT

Seyda rahêje qelem ûdiwêt
Ka binivîse êrîşa kuwêt

Xelkên kuwêtê tevde belav bûn
Bajar herivî tev bûn şel û şêt

Seddamê xedar êrîş bire ser
Êrîş birin ser tevde kirin pêt

Ev wehşê xedar divê nemî ne
Xwîna gelê xwe ewî tevde rêt

Cîran û xwedî wî tev firotin
Azad û hesen tirkî gerabêt

Segê her ket ye vê roj hilatê
Leşkerê xerbê jibo wî tev têt

Xelîc bi carek tev de bi der da
Xêrat hemî çûn welat hemî mêt

Delav tev de xist bin lingê leşker
Tevde li karên kesên rû kirêt

Vî hovî ne hişt kes bidî dil geş
Dever bi der da û tev kire pêt

Destên hev bigirin tev lê bibin yek
Zanim ku ev yek ji me tevan têt

Vî qeşmerê han divê hilînin
Eger bi kêbî û çi bi me bêt

Dever xera kir tev da ye dijmin
Vîna bavêjin berd nê ji welêt

## HELEBÇA BIRÎN DAR

Ey şhîdên Helebça birîndar
rabin binêrin bû qîr û hewar

Gel tev rabû ye li rêjîma erş
Li jêr û li jor yevde bûye ar

Bi sûda mezin hemî sûd di xun
Li ser neyaran hemî gurên har

Armanc û nîşan danîne ber xwe
Dengê wan tê we bibin alî kar

Tev bûn şerîpan li rêl û çiyan
Hatin da girtin newal û zinar

Va zarokên hûr tev hatin kuştin
Ji çavên dayîk rûndik hatin xwar

Girî û fxan her ji wan diçûn
Kal û pîrên wan pê xwaş û bi dar

Çavên wan li jor ji bo nan û av
Êrîş dikirin dema di hat xwar

Yên alîkarî nedin gelên me
Em jî dostayê nadin wî tucar

Yên ku ji bo Kurd ger nekin gazî
Em û ew tucar nabin dost û tar

Jin û mêrên wan tev de diçin şer
Wê wan ji hevdû bikin pare par

Diçin ser seddam ji bo herin dam
Rêcîma Seddam divin bînin xwar

Ev rêjîma han divê nemî ne
Divê bikevî bibin ter û mar

Me kîn hilanî nava me tijje
Emê bişkî nin çeper û dîwar

Dlên me bi kîn kezeb bûye xwîn
Ji girr û kînê hinav hatin xwar

Xan û manên wan em hil weşînin
Emê bi hêrin kevir û zinnar

Gelên Îraq tev dibin birên hev
Wê zû bavêjin holakê xedar

Mizgîn me li te helebça dil soz
Gel tev bi carsk li wan bûye kar

Ew hew di xwazin rêjîma seddam
Divê nemîni kesên sitem kar

Destên hev digrin gelên îraq tev
Divin bavê jin rêjîm gemar

Divê bê kuştin Seddamê xwîn rêj
Tev Kurd û Ereb vêna bikin kar

Dijimin di revin ji Kurdistanê
Besra kerbela lê dibin neyar

Zora wî çûye rêlê teng bûye
Nema li Îraq ew dibî serdar

Rêjîma faşist ji hev dikevî
Gel dijminên wan li herçar kenar

Xwîn pir rijandin Kurdên qehreman
Li cîhan tevî bûne pesne dar

Rabin şehîdên helebça gernas
Gelê Kurd nema dikevî bindar

Bi darê zorê vedigerin welat
Li ser gora we wê deynin çinar

Qada Îraqê wê rizgar bikin
Millet bi hevre va bûye bizmar

Dil xweş hûn paldin şehîdên buha
Wê bên avêtin ew kesên xwîn xwar

Ser hildana gel tev bikin pîroz
Kas û taşa wan min îroj ve xwar

Heyfa şehîdan li wan nahê lin
Wilo soz dane derxistin biryar

Me dost nas kirin dijmin bûn xuya
Li cem gelê me tev bûne hijmar

Gelî şehîdên Kurdên qehreman
Rehmet li we bin hezar hezar car

## XWESTINA MIN JI JINAN

Gelî jinan di xwazim ez dusê pirsan
Ji wer bêjim divê îşev gudarî bin

Li min negrin hinek gotin dibî hişkbin
Bela xayor hebî îroj divê îşevbirin cî bin

Li vê cejnê hûn kêf xweşbin jinên Kurdî
Di xwazim ku hûn kêf xweşbin aqillî bin

Dema we ye divê rabin jina ser best
Divim jinên delê Kurdî xuyanî bin

Şer û pevxxûn dinav wan de divê bimrî
Divê herdem di xwazim hûn bihaştî bin

Li Kurdistan divê ku jin hemî rabin
Na xwazim qet jinên Kurdî şikestî bin

Divim gavan berû pêş de jin bavê jin
Bela herkes bizanî hûn partî bin

Ji bo mafê xwe hûn bêjin şev û rojan
Divê zar û zimanên we vewesttî bin

Ji pişt perdê hûn der kevin wein meydan
Li ser mafê xwe hûn herdem ve xurtî bin

Ji we çêtir kesek nîne bi dilovanî
Li cejnû şahiyan divim hûn xwestî bin

Xwedî wijdan dibêjin jin xwedî mafin
Li perlemanan di xwazin jin bi kursî bin

Jinên Kurdî divê rabin bikin xebat
Çima kêm bin heta îroj bifihtî bin

Fedî bavên xwe rapêçin werin cengê
Kêmasiye jinên Kurdî bi sistî bin

Ji bo xwe hûn divê rabin bikin qîrîn
Di xwazim li şev reşê hûn ruhnîbin

Heta îroj cîhenê hûn bê mafin
Li kongiran di xwazim jin xwedî cîbin

Îroj roja weye rabin jinên delal
Divim gerdem jimên Kurdî bi şadî bin

Dema ku jin bi şadî dibin rewşan
Hi dev nêrgiz dibarin wê bi findî bin

Hûn na nêrin li her gumdên felstînê
Hûnjî wek wan li doza xwe bi hêvî bin

Bi pêlan jin diçin dijmin şev û rojan
Na xwazim hûn li mal tev de rûniştî bin

Hûn barên xwe bi destên xwe bibin jorê
Çima hûnê li bin destan şikestî bin

Bela gewrî û sîng zend tijî zêr bin
Çima wê jin belengaz bin birçî bin

Guhên xwe hûn bidin seyda livê pisê
Li we rewşen dibî hertşt gihiştî bin

Berê xwe hûn bidin laleş biya min bî
Bela goman li nik pîrê zerdeştî bin

Besin rola şiyarî hûn werin bigrin
Jinên Kurdî bivî dînî perestî bin

## JI VIR .......
## BERÊ EVÎNÎ Û FILKILORÎ DEST PÊ DIKE

## EZ Û YAR

Me himbêz kir û keç me dest lê gerand
Ji zora me bişkoj hemî tev fitand

Me xweş rahejand û ji herdû milan
Me destên xwe kir hunurên paxilan

Me nijt av ji lêvan me dil lir tijî
Ji hiş çûm bû me berda mejî

Kenî keç bi hêdî di got min kuro
Fehete li derve were hundiro

Bi carek te perde memî tev çirand
Te kofî û kolos te tev gindirand

Zimanê xwe bigre ji van gotinan
Te gul tev weşandin ji van sosinan

Te bexçe xerakir bidînî ketê
Nehişt ku pêwan bikin nobetê

Te tev dane erdê ku sênc û çeper
Na hiştin te bend û dîwarên li ber

Te tev hilweşandin dîwarên ewî
Ne hiştin te sênc û ne mêwîn tirî

Te tev daweşandin bîhok û hinar
Te tev qurmiçandin kulîk û buhar

Nehiştrin te morî û mircan û kil
Ji reng tev ketin por û hibrî cil

Bihevre ji qamê li erdê ketin
Nema bîr dibim em hev daketin

Te kir wek peza ku gurê har li ser
Hemî der te xêzdan ji nig ta biser

Me dil kirt bi hevre me soz daye hev
Civanek me dahev li pişt gund bişev

Emê hevdû bigrin  bibin ser çiya
Bibin pirs girêka gel û gndiya

## BÛYE BELA MIN

Bi şev destan digerînim
Sêng û beran ez nabînim
Wê demê dil bi birînim
Bûye bela tu ji min re

Hewar û zar zara mine
Zanim bela mi ji dijmine
Yarê jimin sitan dine
Gelo wê kengî vegere

Bê wijdanên dijmin pirin
Şev û rojê lê di gerin
Rojkê ditirsim bigirin
Li wan bikim ceng û şere

Gula buhara  min tuye
Sêva li dara min tuye
Gula hinara min tuye
Dijmin te dibin ji xwere

Te dil ji min sitan diye
Serî li min geran diye
Dijmin li xwe hewan diye
Bûye kul û derd ji mere

Rondik sorbûne ji xwînê
Hewar ji derdê birînê
Çavên min hew te dibînê
Derman tuîne ji mere

Te xweîn ji me va te weraft
Va te dilê min jî quraft
Kezeb li min va te bişaft
Jana te da her devere

Li ser te ez va bûme dîn
Hinav û dil va buye xweîn
Dil va tijî bûye evîn
Neyae vaye li ber dere

Tu ser dara gulaye lê
Giran û pir buha ye lê
Liser navê me naye lê
Givim te bînim ji xwere

Li nav malan tu nemeşe
Zanî bimin pir ne xweşe
Li ser navê min keleşe
Tirsim ji destê min here

## YARÊ JI MIN BIGERE

Yarê ji min bigere
Li halê min binere
Ez wertîm bi tere
Bi mere tu dijminî

Min birêkê dişîne
Bi dijmîn re dimîne
Di xwazî ruh bistî ne
Gir te girtî ji minî

Li min hinav te hiland
Ruhê şêrîn te berand
Dil û kezeb te revand
Zanim bi min dikenî

Li min bike silavê
Me bavêje ber avê
Min nexe av giravê
Va te dilê min çinî

Bi naziyan te kuştim
Ji zulma te birij tim
Bê kes û kûs te hiştim
Jiyan li min sekinî

Bes li min de hewarê
Ji ser me qet tu narê
Mîna gura buharê
Bese êdî ez benî

Bi xecerê nayên min
Ji ber te hey heyê min
Kûr bûne tev keyê min
Rûnî li me kir tenî

Min ne kuje bi gulan
Dûrî me her bi dilan
Te dil dagirt ji kulan
Cîhan li me qetinî

Li min nede awirê
Ez guneme gawirê
Çima tu min digirê
Ji min re tu jinî

Bese te ez dîn kirim
Can û cegerxwîn kirim
Bi lêdanê şîn kirim
Geloo çidivî ji minî

Yarê tu tara me ye
Sêva li dara me ye
Her kes zanî ya minî

## MÊVANA MIN

Lê mêvanê lê- lê ciwanê lê
Dilovanê lê- tu nîşanî way

Zer û sorê lê- gulî morê lê
Li ser dorê lê- binîşanî way

Bejin rindê lê- mûm û findê way
Bûka gundê lê- xweş xuyanî way

Tê ji malê lê- pir delalê lê
Ebrû dalê lê- tu hozanî way

Dil buharê lê- kata darê lê
Gul hinarê lê- li ser xamî way

Gul bibînê lê- dar hişînê lê
Dil evînê lê- perîşanî way

Birîndarim lê- bendewarim lê
Bê buharim lê- dil kovanî way

Li zindanim lê perîşanim lê
Bê dermanim - dil êşanî way

Serê salê lê bine salê lê
Nayê malê lê ma tu kanî way

Te ez kuştim lê va runiştim lê
Ez birçîme lê - tu nizanî way

## KILÎTA DERGÊ DILÊ YARÊ

Kilîta der dilê yarê hilavêt
Kete derya mezin êdî çewa tet

Çiq ku dûr be ez derînim
Ezê bînim di çava de hilî nim

Ji min pê ve nikarî kes derînî
Wê avêtê ji bo mêran bibinî

Dixwazî ku lilîtê ez derînim
Ezê bînim eger salek bimînim

Binê deyan bi carek ez li hevdim
Ezê bînim eger ku can bi serdim

Ku kûrtit be ji Etles jî hesa ne
Himber yarê çiqa kûr ne xuya ne

Kilîta xwe ji bo min wê hilanî
Li min nêrî bi dil min tê deranî

Divê ku min bidî nasîn bi her kes
Ne Tirk û Farisan û ez ne Çerkez

Kurê Kurdim gelek merdim ji bo wê
Dizanî anîna miftê ji min tê

Eger avêtiye derya Hadî gewre
Bi min saî û safî qet ne ewre

Eger hûtan li hevdû par vekir ye
Bihêlim ku bibêjin va me bir ye

Kiklît nabe ji destê min xilas be
Ezê bînim çiqasî ku ne nas be

Eger avê tibe derya yê Hindî
Ezê derxim çiqasî kûr û nependî

Bibim peywan li ber dergahê deryan
Bi parêzim kilîta dergê Zeryan

Divê kes noq nebê derya dilê min
Divê zêde nekin derd û kulê min

Heta saxim li ser wan ez bikim şer
Ji bo wana dibim dijmin li herder

Heta saxim nema ew tên ber avê
Wê ew bêjin me ev kilît qe navê

Hemî zanin ku avjen wek me nînin
Hev nas dikin dema hev bibînin

Bi hezaran me dan kuştin li ser wê
Li herder em belav bûne ji ber wê

Bejin dara çinarê gul hinarê
Surra sibê sîka danê êvarê

Bi yara xwe divê şabim şev û roj
Ji bîr nakin ewê berfa sipî doz

Tucar nabe bighê keskî ji bil min
Ji ber min bawerî nîne bi kesî din

Ne poşmanim ku ez wê deynim
Ezê çawa kilîtê bo xwe neynim

Dixwazim ku zû derxim bidime destan
Ji bo ku der li min bê berdî derdan

## YARA MIN

Yara me the hundir
Rewşen dida xurt û pir
Di nav mede hebû surr
Nabêjim kes tucarî

Naz balgihek me da ber
Ewê pala xwe da ser
Me gotê tu heroj wer
Şekir ji dev dibarî

Li ser te ez di pirsim
Tu zanî ez na tirsim
Zanî ku xurt u girsim
Li ser dijmin xedarî

Wê go ez dil birînim
Hinav û dil bixwînim
Êdî nema min xwe girt
Li ser wê har û dînim

Dema ew hat ji der de
Xencer û şûr di ber de
Me got tu çi dixwazî
Avêt perda bi ser de

Nazê bi nazî palda
Maçek ji rû û dalda
Serxweş û gêj ketim ez
Bê ruh û can me palda

Go bes te dil kire pêt
Te can jî kir şel û şet
Dev û lêvan tu ber d
Te xwîn ji rû hemî mêt

Min go nazê te kuştim
Bi sotin te birş tim
Bê ruh û can wê kuştim
Perde ji bo me avêt

Go hatime ji bo te
Dilê min jî te so te
He va ye nû gihştim
Bes bike pote pote

Min nête hew dîçim ez
Tev hiliyan cerg û bez
Ez tim li vir dimînim
Min dane te baxx û rez

## ŞÊRÎN ŞÊRÎNE

Tu şêrîn û hingivî ne
Li cîhanê wek te nîne
Şev û roj ez lê digerim
Min dil ji ber wê birîne

Şêrîna min tu şêrîn
Pir tenik û naze nînî
Çi gava ku te nabînim
Agir bi navê dixînî

Şêrîna min tu ber malî
Wer bi nere li vî halî
Çigava ku te nabînim
Hêstir ji çav nabin xalî

Şêrîna mi tu esmerî
Pir hêjyaye zêrê zerî
Dema ku ez te nabînim
Keszeba min te kir ker

Şerîna min tu hêja ye
Tu sereka zeriya ye
Eger ku ez te nebînim
Dilê min pir ji te ma ye

Şêrînê ez belengazim
Şev û rojê ez ranazim
Herdemê ez te nebînim
Zanî bi min te dixwazim

Şêrîna min tu buhaye
Li ser navê me tu ma ye
Dema ku ez te nebînim
Dilê mi bi te ve ma ye

## HEVALA BÊRÎVANÊ

Bêrîvanê meşiya
Kilê çavan rijiya
Bejn û bala tey zirav
Dilê xorta êşiya

Bêrîvan hat xwe li ba kir
Mala xortan xera kir
Dema ku cû bêriyê
Xwe ji ber çavan winda kir

Bêrîvan çu bêrî yê
Lawik daket pêşî yê
Dema vegerya malê
Dew kila bi sêpî yê

Pez hatî perê mala
Yarê bankir hevala
Werin herin bêriyê
Gelî xort û delala

Pez hatî ser bênderê
Bêrîvanê esmerê
Rabe karê xwe bike
Li hevalan tu derê

Emê hevdû birevînin
Xwe ji ber çavan bixînin
Guft û go gelek hene
Emê kulan derînin

Bêrîvana şikakî
Dev û bêvil çilakî
Mala gelka xerakir
Bi dilê kesî nakî

Bêrîvana Kurdaye
Dilê Kurdan jê ma ye
Em hemî bê hiş kirin
Ew sebe ba bela ye

Doza me li bavê wê ye
Li dê û xale wê ye
Dema ku wê ne din min
Min dixin ber belê ye

Tu belan qebul nakim
Ezê dinyê xrakim
Her divê ku bistînim
Wê alê ber bi bakim

Bêrîvan hizî mizî
Ev lawik lê qelizî
Dema lawik ew didî
Wê dilê wî didizî

## BEJINA BILIND

Aşîqê bejinê me ez
Tev hiliyan cerg û bez
Bi ser mede wer bilez
Da em biçin bax û rez

Herdem hişê min li ser
Bo te bêjim hin xeber
Da biçinin gulên zer
Li bin moriyan bikim ger

Beja te dara sero
Yan jî gula ber biro
Te soz dida min hero
Bende teme şev û ro

Agir li dil te dada
Dilê min girt û bada
Wek agirê li zada
Hiş û sewdan bera da

Wer da ez te bibînim
Mizgîn li dil bişîinim
Hinav û dil bi xwînim
Derd û kulan derînim

Bejin takê riha nê
Dil û kezeb mi danê
Wê ez xisim meydanê
Ez bir me ber talanê

Wê zeriya şox û şeng
Wê ez kirme ser û ceng
Wê z dame ber xedeng
Wê dil li min kir pereng

Lawik li ser wê dîne
Dil kul û tev birî ne
Kor bûye hew dibî ne
Min ji reşe derî ne

Dengekî kûr ji dil tê
Ji kaniyek bi kul tê
Derdê giran ji mil tê
Tirsim ji dest bi fil tê

Êşa me pir xedare
Rûndik ji çav dibare
Dijmin li me siware
Êşek mezin dibare

## EZ Û GEWRÊ

Ez û tu yarê lê- diçin zozana way
Zozan bilinde lê- diçin asmana way

Zozanê jorî lê- sipî ji berfê way
Sîpanê bilin lê- dikî bi herfê way

Qaz û qulingan lê- li jor qiringe way
Divê hilgirim lê- rext û tivinge way

Li ber zozanan lê- av û şenhaî way
Ez û gewra xwe lê- bikêf û şahî way

Baran dibarî lê- xunav dibarî way
Me pevre dan hev lê- gulên buharî way

Gulên sor û zer lê- me kirin himbêz way
Bîna gulan xweş tê- li me dibin hêz way

Ez û gewra xwe tên- nêzîkî mala way
Nrîna min û wê- li hev helala way

Tu bû kebanî lê- ez bû me malxo way
Herkes dizanî lê- mal li me ava bû way

Govendê cêkin lê- govend û dîlan way
Destên xwe têkin lê- destê perîşan way

## LISER BÛKÊ

Lê xuwîşkê bûkê- bo çi te wakir
Dîna xwe li me- te pir bhakir

Lê lê gulokê- bo çi tu digrî
Kanî xweşkokê- negrî û negirî

Em bidin dû te- herdem û gava
Em te di xwazin- ji dê û bava

Bûkê delalê- tu xweş hevalê
Rabe xwe karke- dam herna malê

Bûkê şêrî ne- sor û sipî ne
Yên wek delal- hê me nedî ne

Bûkê de rabe- fehêt û şer me
Rêka me dûre- havîn û ger me

Zaveyo ra be- tu bi lezî ne
Destê wê bigre- wê rakişî ne

Bûme ji bavê- bi zor bistî ne
Dilê dêka wê jî- bi êşî ne

Bûk bûka me ye- heq me lê heye
Heqê dêw bavê- li me tune ye

Yan em bistînin- yan ser bişkînin
Emê heyfa xwe- ji bavê hilînin

## ÇÛM GOVENDÊ

Çûbûm bovendê- govend geriya
Çûbûm govendê- govend heriya
Li ber bê ketin - şaên zeriya
Li ber bê ketin- şaên zeriya
Mal li me xera kir - keçka cindiya
Mal li me xerakir- keçka cindiya

Kuro dela lo- dam herne malê
Kuro dela lo - dam herne malê
Kerem ke rûne- bo min delalê
Kerem ke rûne- bo min edalê
Da zemberîşan- zû bidme palê
Da zemberîşan- zû bidme palê

Hatim rûiştim - liser kulêvo
Hatim rûiştim - liser kulêvo
Maçek dida min- ji dev û levo
Maçek dida min- ji dev û levo
Hinarê rûkan- wek xox û sêvo
Hinarê rûkan- wek xox û sêvo

## HEROJ BENDE WARIM

Heroj bende warim    kî zani tû yarim
Bîna gulan xwarim-    van gulên buharê

Bi hewar û zarrim-    belengaz û jarim
Ji ber te nikarim-    şêrîn û xumarê

Li ber te şiyarim -    bîna te ez xwarim
Li herçar kenarim-    gula pasimbarê

Tu bê mal û yare-    ejî bê bindarim
Tu sêva ser dare-    tu ye pesindarê

Va ye ez xemgînim-    dilê xwe têşînim
Va xeînê davê jim-    ji ber jana yarê

Dil bi kul û kînim -    va ye dil birînim
Li ser te xemgînim-    sibeh û êvarê

Tu zanî bê cî me-    şev û roj birçî me
Gunhî min tunî ne-    lê rind û ciwanê

Tim  bi ah û nalim-    zanî bê pirgalim
Fireh û wek şalim-    şerîn û şepa lê

Rojek tu  mêvanî-    bi nav û nîşanî
Seyda bi dil zanî-    dakeve meydanê

Emê hev hmbêz kin    kum û morî rêzkin
Sîng beran xêz kin -    hevdû bînin xwarê

## HEY NAZÊ NAZÊ

Hey nazê nazê nazê
Şêrîn gerden gazê
Dilê min ji me ye
Wek min va tu na xwazê

Nazê naz û naz darî
Wek wê gula buhaeî
Vate me bi derda ye
Sêva zer û soe tarî

Nazê wer mala me ye
Tişkî bike mahne ye
Kula te bi mer ma ye
Goman me bi ter he ye

Çavan li min bişkî ne
Wê fediyê tu hilî ne
Ga va ku te bibînim
Dilê min tu dê şîne

Nazê çêtire ji naza
Qirka wê ya qaza
Dil min bi wêre ma ye
Dikim doz ûda xwaza

Emê govnda çê kin
Gulkû gulbenda lêkin
Saz benda ha yû na ye
Xemla wê bi lez çêkin

Ev dem dema buha re
Derenge de êva re
Ev bûka me hêja ye
Zave te dike kare

Va baranê xumî ne
Ba û terzan tî ne
Xeber û gotin çûye
Zave û bûkê hevdî ne

Bayê baranê xur te
Ber bûwan firte firte
Bavê bûkê ser hişke
Xortan pêsêrê girte

Buka me divê der xin
Zavayê me di berxin
Bûka me pir şêrî ne
Rê tev newal û herxin

Berf û naranê dayê
Zave awirrk da ye
Bavê bûkê şerpilî
Derket ji ber derga yê

Bûka me pir hêja ye
Naxta wê pir buha ye
Ev  terşû talan tev de
Hê nexta wê derna ye

Bûka me genim  gwî ne
Gewrû sor û sipî ne
Em wê bi kesî nadin
Ber dilê me şêrî ne

Hey nazê nazê nazê
Kerem ke were razê
Zave jî pir hêjja ye
Bêyî te nikarê razê

## NAZ Û XANIM

Dikim na kim lê tu derna yê lê nazû xanim
Ji min re tu bûye bela yê lê terka canim

Hiş û sewdan bo te nema yê lê naz û xanim
Serê min bo te ket bela yê lê terka canim

Binya mala me tev bexçe ye lê nazû xanim
Tevê gulan va tê de heye lê terka canim

Ji gulan gula lê ber bero me lê naz û xanim
Sor û sipî lî wek pembo me lê terka canim

Ji vê dara lê dar hirmi yê lê naz û xanim
Rengê zerû lê hem xemri yê lê terka canim

Govend greiya lê ji mala me ye lê naz û xanim
Ev da wet ya lê min û te ye lê terka canim

Xortû keçik lê tên dîlanê lê naz û xanim
Li gastînê lê li meydanê lê terka canim

Destê neyar lê zû gihanê lê naz û xanim
Min aniye lê ber ber danê lê terka canim

Min va da ye lê ber nîşanê lê naz û xanim
Di xewazim bigrim ciwanê lê terka canim

## CANA DIL

Lê can lê can lê canê lê lê canê
Te digot ez te ji bîr nakim  de lala min

Canê hatû ji wêda  lê lê canê
Bezîm çû me ber pê da de lala min

Canê destê xwe da min lê lê canê
Dilê min lê bû amin  de lala min

Canê tu bi qerdrê xwe kê lê lê canê
Tê min ji bîra nekê de lala min

Ê min ez te ji bîr nakim lê lê canê
Or ta me xera nakim  de lala min

Çi gava te di bînim lê lê canê
Kulan ji dil dertî nim  de lala min

Ezê dijmin biskî nim lê lê canê
Serî lê bi gerî nim  de lala min

Rokê ez te distî nim  lê lê canê
Serê dijmin dişkî nim de lala  min

Tu Kurdista na me ye  lê lê canê
Ya bav û kalê me ye de lala  min

Her dem tu li bala minî lê lê canê
Mîna keç xala minî de lala min

Nabî kes te ji xwer bibî lê lê canê
Yê bi xwazî wê nebî de lala min

## DIL XWEŞ DIBIM

Dema bo min dişînî na maya xwe
Dilê min derdixî ji razeya xwe

Pênûs digrim li ser kaxez dikim ceng
Bi navê te cîhan ez didim deng

Bi xurtî ez diçim torê şev û roj
Her û her ez li vê dorê dikim doz

Te ez hildam birim jorê li banî
Ji ser min te hilanî bar giranî

Were bawer bike ji min bibî ne
Binêre hundurê min tev de xwîne

Eger raste divê rastî herî ser
Li ser vêna gerek ez tu bilin ger

Divê her kes bi doza xwe bibî şa
Bike talan ji yara xwe ebrûma

Ji jiyanê neke gazin ser û ber
Binêre kef xweş û ser best li himber

Ma çi dibî ku wihareng bê te meydan
Li cîhanê nemînin qet perîşan

Li ser vê ez dibêjim tim dikarim ceng
Li dest min qet tunîne yek rê û reng

Bivî halî me çê nekir derdê xwe
Me pir îsand dilê xwe û serê xwe

Emê çi bikin ji destên me çi dertê
Bivî karî rojkê roja me dertê

## HERÊ YARÊ

Herê yarê ji bo te ez ciwanim
Li pist perdê e na bînim tu xanim

Wê perdê zû hiline da bi bînim
Eger ku ez nebînim can giranim

Ji ber der ba te va ez pûç û xavim
Eger ku ra nekî perdê çi zanim

Tu nabînî va pîr û sipî bûm
Bi min zanî ku bê çav û diranim

Berî bim rim di xwazim te bibînim
Tu zanî beyî te hiş û ne zanim

Bi dil rojê hezar car te dibî nim
Şev û rojê li ber te ez şiva nim

Li ser te dil kulû her dem birînim
Tu na bînî ku pişt xwar û kevanim

Bi roj û şev ji bo te va dikim qîr
Binê re va belengaz û ziza nim

Qebûl nakim tu ya kes bî ji bil min
Li ser dijmin timî reş dixa nim

Ji cîhanê tu tenha ye ji bo min
Ji bo te ez wekî beran û anim

Li wê bejnê qolê zêran bikim rêz
Tu zanî ku tuye nav û nîşanim

Li êvaran heroj bo te di nalim
Ji bo te wek şalûrê çil zimanim

## MAZA MIN Û YARÊ

Sêrîne û gelek delal û nazê
Fermo de rûne li ser vê mazê

Guhdarî bike li dengê sazê
Zanim wekî min tu jî dixwazê

Ger mey û qedeh hebî dixwazim
Ta sibhê dikarim ez ne razim

Ser xoşî bibim ez ser firazim
Yek ser û bi ken û bi tinazim

Delalê ji zûve dil birînim
Ger çi bi xwazî ez bo te bînim

Kasê li dû kasadî werî nim
Her tiştî ji bo te bicivî nim

Fotên xwe me ke ez te bibînim
Gulan bide min da te bi xwînim

Bê mey û qedeh te di hejî nim
Tirsim te bi dar bestê bi şînim

Nasnakî tu min ez Keleşo me
Ser mazê ku dîn bûm beleşo me

Sed cam û qedeh ez keşêşo me
Mifriq û ji pola qeleso me

Fortên te dibî nim hemî vala
Tev badî hewa li ber xezala

Awirek bidim ji bin du dala
Termê te bidim milên hevala

## YARA ŞÊRÎN

Yara me pesinda re
Wek dara li zina re
Va tê bi xezeb tê
Awirda min xedare

Derba ku li min da ye
Me ji ber jan û heware
Gerden ji zer û gewher
Kofî ji zêran xwa re

Baranê lê kir
Xunavê lê kir lê kir
Siwaran hume hume
Xweşmera lê kir xare

Rîhana ber çema ye
Zîwana li zada ye
Kesk û sor û zer boze
Çîçeka li buha re

Yara min pir şêrî ne
Wek wena min nedî ne
Pesnê wê ciqas bê jim
Herkes zanî nav dare

Ez buhayê wê zanim
Pir bêjim ne poşmanim
Min gelek nav tê da ye
Heroj bûka êva re

Rîhana li ber bê ye
Navê me timî lê ye
Ta saxim ji bîr na kim
Doz dikim ji Kurda re

Yar yara me tev da ye
Ya keçik û xorta ye
Em divê tevde hernî
Ji bo li xwe bikin pare

Pir li cem min buha ye
Bi malê dinê na ye
Ser dara ciwana tu
Ji bo te dikim kare

Pir zer û sipî sore
Xemrî û gulî more
Berfa zinarê jore
Dermanê birîn dare

Lê gulê gulî şengê
Rabe li me derengê
Berê xwe bidin malê
Va ye li me êvare

Pir sal û zeman çû ne
Reng û deng belav bûne
Çîroka me gira ne
Jêre divin pir kare

## HOB YARÊ

(Hob yarê yarê yarê
Hob yarê kanî yarê
Ramûsanek min lê ye
Sozda ye min evarê

Hob yarê lê yar kokê
Bisk berda ne ser çokê
Rû sorê gewr û boze
Şêrî nê şimamokê

(Hob yarê yarê yarê
Hob yarê kanî yarê
Ramûsanek min lê ye
Sozda ye min evarê

Yarê çû nav bistana
Van xortan xar berda na
Lê kirin dei we û doze
Doz doza ramûsana

(Hob yarê yarê yarê
Hob yarê kanî yarê
Ramûsanek min lê ye
Sozda ye min evarê

Yare çû ye bêriyê
Lawiki kete pêşiyê
Jê dikir hin hêvîyê
Hêviya yek hedîyê

(Hob yarê yarê yarê
Hob yarê kanî yarê
Ramûsanek min lê ye
Sozda ye min evarê

Yarê çû ye avê yo
Çavê van xortan lê yo
Dema nêzîkî wê bun
Bûn xulamê bejnê yo

(Hob yarê yarê yarê
Hob yarê kanî yarê
Ramûsanek min lê ye
Sozda ye min evarê

Yarê çû ye qurmikan
Tolê çû ye qurmikan
Xort tev de çûn pê şiyê
Dan dorê wek qirdikan

(Hob yarê yarê yarê
Hob yarê kanî yarê
Ramûsanek min lê ye
Sozda ye min evarê

Yarê hat û mesiya
Kilê çavan rijiya
Gava çavê min le ket
Serê min zû hejiya

(Hob yarê yarê yarê
Hob yarê kanî yarê
Ramûsanek min lê ye
Sozda ye min evarê

Yarê hat û xwe li bakir
Mala xortan xerakir
Çaven xorta tev lê bû
Pevçun li wan peydakir

(Hob yarê yarê yarê
Hob yarê kanî yarê
Ramûsanek min lê ye
Sozda ye min evarê

Yarê tê ye ji nav mala
Tolê tê ji nav mala
Xortino dewerin herinê
Yarê ji were helala

(Hob yarê yarê yarê
Hob yarê kanî yarê
Ramûsanek min lê ye
Sozda ye min evarê

## WÊ DIL JI MIN SITANDÎ

Wê dil ji min sitandî
Serî li min gerandî
Bê ser û ber dimînim
Min ser li ber tewand

Kezeb revandî xanim
Zanî ku ez nezanim
Te dil hesin ji pola
Çima te kir nizanim

Zanî umrê mi çendî
Wê nifusa mi xwendî
Zanî kengî bimirim
Xwe ji ber me kir nependî

Ez ne dîn û bê havil
Di çirînim kinc û cil
Her kes bi min di kenî
Di hejin beden û mil

Terîş ji min dibin rêz
Sipî ji min dibin cêz
Zarok li dor me komin
Li dor me dikiron xêz

Hinav û dil birî nim
Ser di ber de hezînim
Kî ku li min dinê rî
Zanî bi min ku dînim

Gotinên çewt dibê jim
Gelek zanim dirêjim
Bîn û buxar ji min tê
Wekî dînan dipêjim

Ne xweş û dîn û gêjim
Ser çav û dest qirêjim
Tazî û birçî mame
Por û nenûk dirêjim

Doste xwe kes nabînim
Belkî mirovekî dînim
Heyfa her kes li min tê
Xwe li neynikê dibînim

Bo çi te wer li min kir
Hiş û aqil ji min bir
Heyfa Keleş me avêt
Me dil dikir ji kevir

Bê mal xizan te hiştim
Bi derba xedar te kuştim
Cerg û hinav hilandin
Ji ber janê birjtim

## LÊ ŞEMÊ

Lê şemê şemê- lê şemê şem nemmê
Lê şemê şemme-sewdanê me li cemmê

Şemê çu ye qirşika- le şemê şem nemmê
Memik mîna şerbika - sewdanê me li cemmê

Şemê hat û xwe li ba kir- lê şemê şem nemmê
Mala xortan xerakir- sewdanê me li cemmê

Şemê çu ye bêriyê- lê şemê şem nemmê
Tolê çû ye bê riyê - sewdanê me li cemmê

Lawik fitlî pêşî yê- lê şemê şem nemmê
Kurik fitli pêşî ye- sewdanê me li cemmê

Şemê hat û meşiya lê şemê şem nemmê
Tolê hat û maşiya- sewdanê me li cemmê

Kilê çavan rijiya - lê şemê şem nemmê
Van xortan ji xwer diya- sewdanê me li cemmê

Hat şema kurdistanê-lê şemê şem nemmê
Van xortan xar ber danê-sewdanê me li cemmê

Xortên me zû gihanê- lê şemê şem nemmê
Jê xestin tek incamê- sewdanê me li cemmê

Ka ew şema hekarî- lê şemê şem nemmê
Ka ew tola hekarî- sewdanê me li cemmê

Kulîka her  buharî- lê şemê şem nemmê
Xortan lê kir  hewarî- sewdanê me li cemmê

Şemê kofî girê da- lê şemê şem nemmê
Tolê kofî girrê da- sewdanê me li cemmê

Lawik zû çû ber pê da - lê şemê şem nemmê
Kurik zû çû ber pê da - sewdanê me li cemmê

Li bejnê xemla yerê- lê şemê şem nemmê
Mêvana her êvarê- sewdanê me li cemmê

Şemê çû ye govendê- lê şemê şem nemmê
Dev û lêv şeker qendê- sewdanê me li cemmê

Em  ketine  destê wê da - lê şemê şem nemmê
Qani bû di govendê da - sewdanê me li cemmê

## ŞÊRÎN Û HÛR KINIKÊ

Şêrîn û hûr kinikê
Gelek bi min xweşikê
Paqijê dil tenikê
Êşa te ez ne bînim

Nameyek va ji tere tê
Têx sindoq û sebetê
Bo şêrîna minî çê
Ji bo te ez dişînim

Ava bîra hênike
Rû hingiv û minike
Gulan ji dev çe dike
Divim ez te bibînim

Were tu min bibîne
Gelek tu xwîn şêrîne
Wek te tucar tunîne
Bîna te ez dikşînim

Li min nebe kemine
Dilê min ne êşîne
Hinav li min bi xwî ne
Me can hemî birîne

Zanim tu pir gira ne
Tu himberê zêra ne
Ji durr û cewhera ne
Li ser te pir xemgînim

Rind û şêrîn xuya ne
Ji me re tu nîşane
Bo vî dilî dermane
Kulan ji te hiltînim

Rêkê ji bo me dibî
Çira hundur ku tu bî
Wek cîhan tev ya mibî
Li ser te dil birînim

Guftên te tev lib libin
Sebra dilan ku tu bin
Te distînim bi çibin
Li ser te tim di xwînim

Derba li dil xedare
Naçe ji bîr tucare
Bîtir li nêv êvare
Ji bo te dil têşînim

Bê av mame li wara
Min av ji dev vexwazra
Mîna sêva li dara
Dixwazim te bibînim

Ji ber çavên min nere
Ger çû li min vegere
Şev va li min digire
Li ser te har û dînim

Tu bûye kul ji min re
Dil her li te digere
Eger me ser tê here
Divê ez te bistînim

Dest bide min em herin
Nema li vir vegerin
Me dil tijî xeberin
Li ser te dil birînim

## Seydayê Keleş

Seydayê Keleş di sala 1930 î de li gundê Bizgûrê ji wîlayeta Mêrdîne li bakurê Kurdistanê, hatibû jiyanê. Di 6 saliya temenê xwe de bav û diya wî diçine ber dilovaniya Xwedê, ji feqîrtî dihê rojavayê Kurdistanê dibe.

Li rojavayê Kurdistanê, di temenê 10 salî de, dest bi xwendina olperestiyê kiriye, di sala 1945 an de, dest bi karê welatparêzî û xwendina kurdî kiriye û dan û standinên wî bi rewşenbîrên wê hingê re çêdibin wek Cegerxwîn, Qedrî Can, Mele Ehmed Namî, Seydayê Tîrêj.. û bi wan re dest bi hunandina helbestê dike.. Ji ber ku wî ji biçûkaniyê ve, gelek zilm û zor dîtibû û di gelek cûreyên kar û xebatê kiribû, ji bo pêkanîna gepa nanê xwe û zarokên xwe; ji cotkariyê, şivantiyê, palayiyê û avakirina xaniyan, ji ber van yekan, piraniya ristên wî bi dijwarî û xurtî êrîşî zordestiyê, sitemkariyê û bindestiyê dike, û li dor rewşa gel û welatê xwe bi xurtî sekiniye; ji serketinên welatiyên xwe re lîlandiye û ji têkçûnan re hawar kiriye..
Seydayê Keleş Xwedî 8 dîwanên Helbesta ye:
Ji Dîwanên wî yên çapkirî:
1 Em û Dijmin
2 Rêka Gel
3 Derdê Millet
4 Ronahî
5 Xebat
6 Gotinên Pêşiyan
Yên destnivîs du dîwan û bîranîn e:
1 Berbang
2 Baxistan

3  Bîranînên Min

Di roja 18 cehzeran (xizêrana) de 2007, Seydayê Keleş( Mele Hisênê Bizgûrî) xatirê dawî ji me xwest û çû ber dilovaniya Xwedê,
di mala xwe de li bajarê Qamişlo.
 Di eynî rojê de, di gel cemawerekî zexim ji evindarên peyva kurdî a resen û rêxistinên kurdî, termê wî hat spartin, di rex gora Kemal Ehmed, Şêxmûs û şêx Maşûq de, di goristana Qudûr Beg de li Qamişlo.

**Êkîtiya Nivîserên Kurd-Duhok**

# Çend wêne ji rê û resmên veşartina Seydayê Keleş





















## Ji Weşanên Êkîtiya Nivîserên Kurd - Duhok

1- Nivêjek mestan e li dor gunbeda Cizîrî/ vekolîn, Dr. Fazil Umer- 2004
2- Xewnên tazî/ helbest, Ruxuşê Zîvar- 2004
3- Wexerek di nihêniyên deqî da/ rexne û vekolîn, Yasirê Hesenî- 2004
4- Biyavê xwandinê/ vekolîn, Celal Mistefa- 2004
5- Liber derazînka têkstan/xwandinên wêjeyî, Selam Balayî- 2004
6- Xwandingeha birisîkirinê/ çîrok, Sedîq Hamid- 2004
7- Hizir û dîtin/ hizir û rewşenbîriya kiştî, Dr. Arif Hîtu- 2004
8- Çend riyêk bo deqî/ vekolîn, Sebîh mihemed hesen- 2004
9- Berperekê winda ji jiyannama Selîmê Esmerê/ çîrok, Anwer Mihemed Tahir- 2004
10- Çend xwandinek şêwkarî/ vekolîn, Star Elî- 2005
11- Janên sînahiyê/ roman, Tehsîn Navişkî- 2005
12- Qîses min bîlad al- Nercis, Hesen Silîvanî) çapa duyem 2005
13- Gotarên rexneyî/ komele witar, Hoşeng Şêx Mihemed- 2005
14- Geriyanek di nav baxê edebê kurdî da, Reşîd Findî- 2005
15- Sotingeh/ roman Bilind Mihemed- 2005
16- Siyapoşê zêmarî/ çîrok, De- Fazil Umer- 2005
17- Şanoya hevçerx û çend dîtin/ Siyar Temir- 2005
18- Viyan di demekê jandar da/ roman, Mihsin Abid Al- rehman- 2005
19- Teknîka vegêranê di kurte çîrokên (Fazil Umerî de) vekolîn, Nefîsa Îsmayil- 2005

20- Mîrî û kevok/ çîrokên zarokan, Dr. Abidî Hacî- 2005
21- Hejde çîvanokên gurga/ çîrok, B. Mihemed Abidallih (çapa diwem)- 2005
22- Rustemê Zalê/ filklur, Dr. Arif Hîtu (çapa diwê) - 2005
23- Şihîna çiyayê spî/ kurte çîrok, Nizar Mihemed seîd- 2005
24- Cemiserê siyê/ kurte çîrok, Salid Salih- 2005
25- Ey roj neçe ava/ pexşan, Selam Balayî- 2005
26- Ji rewşenbîriya kurdî/ vekolîn- gotar, Nacî Taha Berwarî- 2005
27- Zarokên cîhana aştî û aşopê/ vekolîn, Hizirivan Abiduallih- 2005
28- Dihok di serboran de/ bîrewerî, Sedîq Hamid- 2005
29- Cak dirêda û helweşandin/ vekolîn, Dr. Fazil Umer- 2005
30- Dawiya şervanekî/ roman, Îsmet Mihemed Bedel- 2005
31- Pêlên rexneyî/ rexne, Nimet Allih Hamid Nihêlî- 2005
32- Dema hêşta giyanewer dişiyan baxivn/ çîvanokên millî, W- Hecî Cefer- 2005
33- Ber bi deqê xomalî/ deq û şirovekirin, Îbrahîm Ehmed Simo- 2005
34- Mêmêtîkis, ji hizirikirinê taku aydyolociyayê/ di- Fazil Umer- 2005
35- Kelitor- - Nasyonalîzim û erebkirin/ vekolîn, Ebdal Nurî- 2005
36- Peyvên bê perde/ vekolînên rexna edebî, Abid Alxaliq Sultan- 2005
37- Nivîstin di çavê nêrgzê da/ helbest, Beşîr Mizûrî- 2005
38- Ji felsefa berxudanê/ helbest, Remezan Îsa- 2005

39- Ewê dijî hemiya/ kurte çîrok, Sebîh Mihemed Hesen- 2005
40- Nijiyargerî/ Dr. Fazil Umer- 2005
41- Bîst sal û êvarek/ roman, Sebirî Silêvaneî- 2005
42- Nivêsîn dinavbera nivîserên xudawend û lêgeryan li azadiyê/ vekolîn, Hoşeng Şêx Mihemed- 2005
43- Ji çîrokên millî yên filklorî/ Cemîl Mihemed Şêlazî- 2005
44- Cewahir Al- mubdeîn/ munaqeşat adbiye, Îsmayil Badî- 2005
45- Dîmenên peçnî/ çîrok, Kîvî Arif- 2005
46- Tîr ji kivana diweşiyên û ber tîne min/ helbest, Selman Kovlî- 2005
47- Kevalekê rwîs/ helbest, Şukirî Şehbaz- 2005
48- Dewlet û eşqeka kevnar/ helbest, Deyka Daliyayê- 2005
49- Şevên bê xew/ helbest, Beyar Bavî- 2005
50- Arzandina bendemanê/ Hizirivan- 2005
51- Çaxê roj dipeyvît/ helbest, Şemal Akireyî- 2005
52- Dû çemkên havîbûn yaxîbûn/ Emîn Abid Alqadir- 2005
53- Rastî û talan/ Sibihî Mirad- 2005
54- Deftera bê gunehiyê/ helbest, Abid Al- rehman Bamerinî- 2005
55- Ziman û zimanivanî/ Abid Al- Wehab Xalid- 2005
56- Evîn, xem û mirin/ helbest, Gîb deştanî- 2005
57- Zindana biçûk/ helbest, Azîz Xemcivîn- 2005
58- Aşiq di behşteka yutubiyayî da/ helbest, Mistefa Selîm- 2005
59- Ezê di hembêza henasên te de/ çîrok, Îsmayil Mistefa- 2006
60- Roman li devera behdînan/ vekolîn, Remezan Hecî- 2006

61- Raya giştî, têgeh û pênasîn û guhorîn û pîvana zanistî/ vekolîn, Mislim Batêlî- 2006

62- Helbesitên rengîn/ helbest, W: Tengezarê Marînî- 2006

63- Tevnikera kurd, hunermenda berze/ vekolîn, W: Mesûd Xalid Gulî- 2006

64- Çapeneniyêt rewşenbîrêt devera behdînan (1935 - 2000) bîlugrafiya, Wesfî Hesen Ridênî- 2006

65- Şeva firîşte revîn/ çîrok, Îsmayil Silêman Hacanî- 2006

66- Gilolika aliziyaî, îdiyemên kurdî, Xalid Salih- 2006

67- Nivêjeka baranê, helbest, Heval Findî- 2006

68- Ruj, helbest, Hişiyar Mihemed Hesen Rêkanî- 2006

69- Ayirdeyên viyanê, helbest, Bilind Mihemed- 2006

70- Derdê evînê(nuvlêt) Yûnis Ahmed 2006

71- Efsaneya stiranên bindesitiyê, Necîb Balayî- 2006

72- Xewneka emirîk (kumeka çîrokên Ezîz Nesîn) W: Xeyirî Buzanî 2006

73- Hizirînek di zimanê kurdî de, Reşîd Findî

74- Xanî mamustayê siyemîn, Mem Şerîf- 2006

75- Ji awazên ciwaniyê, helbest, Nacî Taha Beriwarî- 2006

76- Çend belge name yên mîjwî li dor kurdan, Dr. Selah Hirurî- 2006

77- Meşa bûkan, helbest, Hêvî Berwarî- 2006

78- Ew zelamê digel xwe ji yek cuda, şano, Siyar Temir

79- Pelên eşqê, helbest, Diribas Mistefa- 2006

80- Şevên sar, roman, Hesen Îbrahîm- 2006

81- Helbest bo delalê, helbest, Xalid Hisên- 2006

82- Balulka şekirê, kurte çîrok, Hesen Silêvanî- 2006

83- Heyranok namên evîndaran, fulklor, Adîb Abidullah- 2006

84- Mirin di qişleya padşahî de, kurte çîrok, Mihsin Abid Al- rehman- 2006
85- Cîvanoka gayê sor, fulklor, Cemîl Mihemed Şêlazî- 2006
86- Selwa hêj belalîske, helbest, Luqman Asîhî- 2006
87- Bilîcan, roman, Perwîz Cîhanî- 2006
88- Lê,ilîxana goveyî,çîrok, filiklor,Mistefa Bamernî
89- Vegre- Roman, Şahîn Bekir Suwereklî- 2006
90- Qedera min- helbest- Selman Şêx Memê- 2006
91- Bihnişk- Folklor,Mehemed Hesen Binavî- 2006
92- Armanc- helbest, Sebrî Hekkarî- 2006
93- Bakurê Dil- helbest, Dilşa Yusif- 2006
94- Xwenek Binevşî- çîrok,Esmet Mehemed Bedel- 2006
95- Nehîniyên Xameî- helbest,Sebrî Nehêl- 2006
96- Henasek Di Peristgeha şiirê de, xwendinên wêjeyî, Selam Balayî- 2006
97- Şoreşên Barzan- helbest, Heydar Metînî- 2006
98- Aşqa me çiryeka zerdeştiye, Esmaîl Mistefa- 2006
99- Tenhistan- helbest, Kemal Silevaneyî- 2006
100- Şaxêd dstana Rustemê Zal ê kurdî, Prof- Haçî yê Cundî- 2006
101- Maqalat neqdiye fî nusus el nercis- Mecmuat kutab- 2006
102- Dîwana helbestan, Esmaîl Taha Şahîn- 2006
103- Dev çi nanbihîsin- çîrok, Têlî Salih Mûsa- 2006
104- Şeveka bê nivêj- helbest, Layiq Cemal- 2006
105- Paradoksîzim- lêkolîn, Îsmet Mihemed
106- Dosya Barzanî-lêkolîn, Wezîrê Eşo-2007
107- Helebçe- helbest, Seydayê Keleş- 2007
108- Çavên Sîtavkê-roman , Tehsîn Navişkî- 2007
109- Bakurê Helbestê- Antolojiya, Arjen Arî- 2007
110- Awazên Mirinê- çîrok , Nefîsa Îsmaîl Tahir- 2007
111- Sore Birîna Şeva Min- helbest, Selwa Gulî-2007

112-Aşq Di Xelwetgehên Mirinê de-helbest ,Aştî Germavî-2007
113- Sirûdên Rojihilatî-çîrok, Celal Mistefa-2007
114- Aryana Sînorên Dûr-helbest, Mesûd Xelef-2007

**www.duhokwriters.net**

# NAVEROK


**Pêşgotin........................................................................ 7**
**Helepçe........................................................................10**
**Kurd belengazin........................................... ......18**
**Bo betrolê em perçe bûne.......................................22**
**Barzanî serî rakê....................................................25**
**Şerê Îraq û Îran.............................................. ......29**
**Zulma neyar............................................................32**
**Dijminên faşist........................................................35**
**Ey Helebçe...............................................................38**
**Koma miletan.................................................. ...41**
**Seddamê xwîn  rêj..................................................43**
**Berzê berzan............................................................46**
**Ji seydayê dilovanre......................................... ...48**
**Şerê krviran..............................................................51**
**Felestînî mêrin........................................................ .53**
**Ji bo Felestîn.......................................................... 56**
**Îraq û Felestîn........................................................59**
**Şîna Barzanî.............................................................61**
**Her xemgînim...........................................................65**
**Welat bang dikî............................................... ...67**
**Welat bang dikî............................................... ....69**
**Şîna hevalê Dawid....................................................71**
**Tevgera rast.............................................................74**
**Koma çar çira...........................................................77**
**Helebça dil soz........................................................80**
**Şîna seydayê Tîrêj..................................................84**
**Şîna sazbend Mihmed Şêxo...................................87**
**Şîna Cegerê Reşo......................................... .........91**
**Gotin û şîret.............................................................95**
**Ramanek nuh............................................................97**

**Kovara Gulîstan....................................................99**
**Lalo hevalo.......................................................... ...101**
**Ji gund biçin şaristan......................................... ....103**
**Şîna Ismetê seyda............................................. ......106**
**Bigrin qelem û defter.......................................... ....108**
**Êrîşa Kuwêt........................................................... ..110**
**Helebça birîn dar..................................................112**
**Xwestina min ji jinan............................. ............ .. 116**
**Ez û yar.................................................... ........ ....120**
**Bûye bêla min.................................... ............ ....122**
**Yarê ji min bigere................................. ...... .....124**
**Mêvana min.......................................... .............126**
**Kilîta dergê dilê yarê............................. .............127**
**Yara min............................................................. 130**
**Şêrîn şêrîne..........................................................132**
**Hevala bêrîvanê....................................................134**
**Bejina bilind.................................................... ....136**
**Ez û gewrê.......................................................... ...138**
**Liser bûkê......................................................... ....139**
**Çûm govendê..................................................... ....140**
**Heroj bende warim...............................................141**
**Hey nazê nazê.........................................................142**
**Naz û xanim......................................................... .......145**
**Cana dil................................................................ .......146**
**Dil xweş dibim.......................................................148**
**Herê yarê........................................................... ......150**
**Maza min û yarê..................................................152**
**Yara şêrîn............................................................ ......154**
**Hob yarê................................................................156**
**Wê dil ji min sitandî........................................... ....159**
**Lê şemê................................................................. 161**
**Şêrîn û hûr kinikê.................................................163**